



## Wênesaza têkoşer

Artemîsia Gentileschî di serdema xwe de bûye sembola têkoşîna hebûna jinan. Hunermend, di wêneyên xwe de jinan bi nîşaneyên xurt û jixwebawer xêz dike. Ji bo perwerdeyê, bavê wê bi wênesazê bergehê yê floransayî Agostîna Tassî re li hev dike... *Nesçe Toprak / R.2*



## Bakurî û Nesrînê

Mamoste Bakurî di temenê 80 saliyê de mafdar e ku bi dengê Nesrîn Şêrwan re rondikên çawan bibarîne. Nesrîn Şêrwan jîneke rûxweş, dev bi ken, nêrînên wê tije gotin in. Dema ji hevkarên xwe re mêvandariyê dike deng û kena wê bala her kesî ber bi wê ve dibe... *Kaşar Öremer / R.8*



## Coronavîruseke nû

Di kanûna 2019'an de li Çînê li bajarê Wuhanê di gelek nexweşan de zatûre hate dîtin lê sedema nexweşiyê nedihate zanîn. Piştî lêkolînan di van kesan de Coronavîruseke nû hate tespîtkirin û ev vîrûs wekî 2019-nCoV hate binavkirin... *Dr. Erdal Sipan / R.12*

Rojnameya  
Heftane

www.xwebun.org

# xwebûn

10-16 Sibat 2020

Hejmar: 8

Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org

## TJN'ê berê xwe da Ewropayê

Teatra Jiyana Nû (TJN) bi salan e di bin banê Navenda Çanda Mezopotamyayê de bi kurdî şanoyê dike û heta niha bi dehan listik listine. Koma şanoyê di şert û mercên herî zehmet de xebatên xwe didomîne û niha jî ji bo turneyê berê xwe dide welatên Ewropayê. Turneya ku 9'ê sibatê dest pê dike dê 20'ê sibatê bi dawî bibe û li gelek welatên Ewropayê were listin. Şanoger Omer Şahîn têkildarî turneyê ji rojnameya me re axivî... *R.11*

## Erd heye, deng jî kurdî ye

Prof. Dr. Celîlê Celîl di rêya zanist, dîrok, wêje û folklorê da gelekî xizmet kiriye. Celîlê Celîl têkildarî folklor û zimanê kurdî pirsên rojnameya me bersivandin û wiha got: "Çîrok, çîrokbêjî huner e, huner nema ye. Ziman feqîr bûye, fantazî tune ye. Erd heye, deng jî kurdî ye. Dayik erd


e û dengê dayikê ziman e, ziman jî kurdî ye. Dê erd e ku şîr dide me, şîr ji bo zarokan çî ye; av e, xwarin e, jiyan e. Zarok heta mezin dibe hezar tişt dixwe. Ew jî ziman e ku dîsa ji dayikê têdîgihê. Ew tişt heta silsilê diçe lê dayik dimîne..."

*Hevpeyva Bêrwan Matyar / RÛPEL - 4*

## Platforma ziman çû Enqereyê Bila kurdî bibe zimanê fermî

Platforma Zimanê Kurdî (PZK) berê xwe da Enqereyê, partiyên siyayî yê Tirkîyeyê re hevdişkirin û xwest ku kurdî bibe zimanê fermî. Platformê diyar kir ku bi qursan çareserî ne pêkan e... *RÛPEL - 3*

# Aşûtê exlaq bi bîr xist



Li navçeya Miksê ya Wanê du caran aşût ket û di encamê de 41 kes mirin, 84 kes jî birîndar bûn. Îxmalkariya rayedarên dewletê bobelat mezintir kir. Dema welatî di bin aşûtê de bûn, serokkomar mîting li dar dixist, çapemeniyê mîting zindî weşand. Bobelata xwezayî dîsa mijara exlaqê bi bîr xist... *RÛPEL - 3*

## Kambax e jibîrkirin

Hewldayîna jibîrkirinê bû mişextkirin. Ji ber hişê civakan bi demboriya wan zindî ye. Yê demboriya xwe ji bîr dikin, di rastiyê de yê hatine qirkirin in. Anku qirbûna herî kambax e jibîrkirin. Ji ber vê ye di bawerîya me kurdan de jibîrkirina demboriya xwe, her tim wekî xayintiyê hatiye hesibandin. Ji ber di bingeha civakîbûnê de ne-jibîrkirin û birka hişmendî ya ji demboriyê hatî dagirtin heye... *Reyhan Îke / RÛPEL - 12*

## Li keviya rûbirûbûnê

Li vî bajarî, li hevokên kurdî, yê ku her yek ji wan tenê dikare xwe bi hezkirin û agirê kurdîtiyê biafirîne digirim. Li hevokên ku bikarin rastîya 'kurdûnê' vebêjin, me li kurdî û Kurdistanê vegehin! Kurdîti çî agirek bêdawî ye... Kurdîti çî rêyeke dûr û dirêj e di vê serdema bê wijdan û bê sinc de. Kurdîti çî sebr û ruhekî ji pola ye... Çi zanîneke dûr, bîreke kûr, janneke giran e! Li keviyekê sekinîme niha... *Dilan Aydın / RÛPEL - 8*



## Bêdengî pejirandin e

Ambargoya li ser Mexmûrê hê jî didome. Gelo hêzên navneteweyî, hikûmeta Iraqê û hikûmeta Başûr, li hemberî êriş û ambargoya li ser Mexmûrê çima bêdeng in? Bêdengiya wan tê wateya pejirandin, tenêhiştin û valakirina wargehê... *RÛPEL - 7*

## Vernî de merdimî xerepyayî

Wina eyseno ma çaxêke zehf xerab derbas kenê. Her ke şîno teraza dinya ver bi xerabî şîna. La merdim eşkeno vajo ke vernîya teraza dinya teraza merdimahî xerepya. Vernî de exlaq û wijdanê merdiman xerepya înan zî dima ra ekolojî û heme dinya xerepna. Goreyê daneyanê Rêxistina Zad û Zîretî yê Neteweyê Yewbîyayeyan 3 ra 1ê herra rîferdî xerepyaya... *Nesrîn Navdar / RÛPEL - 9*

**Mizgîn Ronak**  
Daxwazname  
*RÛpel - 2*


**Samî Tan**  
Hestpêkirina surîştî  
*RÛpel - 5*

**Felemez Ulug**  
Planên şaş...  
*RÛpel - 7*

**Şener Ozmen**  
Pilingê Sîngaporî  
*RÛpel - 11*



Neşe Toprak



# Wênesaza têkoşer

Daxwazname

Mizgîn Ronak

Hunera wêneyê, cara ewil di he- yama neolîtîkê de bi xêzkirina nî- garên nêçîrvan û sewalan ên li ser dîwarên şikeftan dest pê kiriye. Her çiqas di destpêkê de wêne, wek hunerê nehatibe dîtin jî di qir- nênan dawiyê de bi pêşketin û guhe- rîna rêbaz û şewaza xwe, di dika dîrokê de wek beşeke hunerê cihê xwe digire. Di nav demê de bi he- zaran wêne tîn çêkirin û gelek wê- nesazên navdar û bi behre (qabiliyet) digihîjin.

Lê belê dema mirov bala xwe didê ev huner tenê wek karê mîran hatiye dîtin û wênesazên jin hatine paşguhkirin. Di vir de dîsa hişmen- diya nêreza ya ku bi sedan salan e em li dijî wê têdikoşin, dertê pêşiya me. Di dîrokê de gelek jinên wênesaz ên li dijî hezaran zor û zehmetî têkoşiyane hene. Yek ji wan jinên bi inyard ku bi dilxwazî û azweriya xwe ya ji bo wêneyê û bi taybetî jî bi nasnameya xwe ya jinê derke- tiye pêş û pêşengî kiriye jî Artemî- sîa Gentileschî ye.

## Wêneyên xurt û jixwebawer

Artemîsîa Gentileschî ya ku di serdema xwe de bûye sembola tê- koşîna hebûna jinan, di sala 1593'yan de li Romayê jî dayik bûye. Gentileschî jî ber ku jin bûye, nikaribûye li dibistanên hu- nerê perwerdeyê bibîne. Wê dest- pêkê perwerdeya xwe li ba bavê xwe ye ku li ser xeta Caravaggîo wênesazekî barok Orazio Genti- leschî dibîne. Wê demê li Ewro- payê, wênesazên jin ên ku wêneyên laşî (anatomî) û nû (tazî) çêdikin, baş nedihatîna pêşwazî- rin. Lê ruhmê wê rewşê jî Genti- leschîyê di wêneyên xwe yê nî- tolojîk û olî (dînî) de nîgarên



xwe tazî xêz dikirin.

Hunermend, di wêneyên xwe de jinan bi nîşaneyên xurt û jixweba- wer xêz dike. Ji bo perwerdeya perspektîfê ya Artemîsîayê, bavê wê bi wênesazê bergehê yê floran- sayî Agostîna Tassî re li hev dike. Lê Gentileschî ku wê demê 19 salî

ye, rastî destdirêjiya Tassî tê. Her çiqas bavê wê doz li Tassî vekiribe jî, ji dadgehê encamek dernakeve. Artemîsîa ev yek di hunera xwe de mîna guleyekê bi kar tîne û bi vî awayî bertekên xwe nîşan dede.

Gentileschîyê gelek caran ser- pêhatiya Judith a di Încîlê de xêz

kir. Ew di sala 1616'an de bû yeke- mîn endama jin a Academia del Di- segnoyê. Bi hinceta ku li gorî exlaqê civakê yê wê serdemê tev- negeriyaye, Artemîsîa Gentileschî gelek caran hate rexnekirin. Di xe- batên wê de jê re gelek astengî hatin derxistin lê dîsa jî wê têko- şîna xwe bînavber domand û li pey heqîqeta xwe ket. Ji ber serpêhati- yê trajîk ên di 20 saliya xwe de, Gentileschîyê di xebatên xwe de pîrî caran cih da tundiyê. Bi vî rêyê jî êş û hestên xwe di wêneyan de xemiland. Di xebata wê ya Ju- dîth de serê Holofernes tê jêkirin. Ji ber vî sedemê jî tî gotin ku ji xe- bata Caravaggîo ya bi heman mi- jarê bandor bûye. Lê dema mirov li kompozîsyonê dinîhêre, dibîne ku vegotîneke pîr cudatir heye.

## Judîth û Holofernes

Mijara 'Judith ve Holofernes' di Încîlê de derbas dibe. Di xebata Caravaggîo de em Judith weke ji- neke ku bi cil û bergên xweşik xwe xemilandî, dema bi şûrê xwe karê malê dike mîna xaniman tevdiqere, rûtirş û karên zehmet pîr bi hêsanî dike, dibînin. Jixwe xizmetkara wan Abra ku pîr e, berxwedaneke wê ya li hemberî rûdanên heyî nî e û her tim li cem xwediyê xwe rû- dinê. Lê Judith a Artemîsîa Genti- leschî ne wisa ye. Di ya Gentileschîyê de mirov jineke tî- gehîştîr û pîr wêrektir dibîne. Şûrê xwe di destê xwe de zehft ki- riye û bi biryar pê digire. Bi vî awayî jî wek jineke bihêztir di- xuyê.

Hunermendên jin ji dîrokê ve hebûna xwe bi fedekarî û bi biryar- darî parastin. Ew ê vî hebûna xwe hîn bihêztir bidomînin...

Min bipirse ji ewran, ji toza stêrkên, ji gulbehîvên xewnan. Min bipirse ji pisikên kedîkîrî, ji xemgîniyên ebedî û zivistanên goreqetiyayî. Ji min bipirse; pîr- sên nepîrs!

Pîrsên jî tîremar û sêncên beyanan. Pîrsên kujer, pîrsên kujerkuj, pîrsên jî bermahiyên pêlavek sedsal berê ku ji lingê serhildêrek fîriyabû li Kardox- yayê. Ji min bipirse; pîrsên dîn û jî nîvşevên dîn, ji tiqetîqa cinên hîvek kurdistanî ku her kes kum û kolosê xwe jê re bi- lind dike.

Min bipirse! Min bipirse; ji 'evînen awira dawî' û jiyana tim ewrewî. Ji çengek ax, ji ka- vîlek li derdora wê "Bêkes" ni- vîsandî. Min bipirse; ji kolanên bi olan, ji lalîtiya kevîrên li ser eniya miriyên sax, ji termê ji- yanê yê li ser milên zindîyan. Min bipirse; ji asîmanê ku qet hembêz nake û erda ku qet te- batiyê nade. Ji gotina ku nikare ji bin zîman derve, ji zîmanê ku xwediyên wî, her kîlî wî bi qurbana zîmanê mijokdarên xwe dikin!

Min bipirse; ka gelo çî me, çawa me, li ku me? Kesera kîjan payîzê, bextê dîniya kîjan hespê, risteya kîjan sermestiyê me. Min bipirse, êdî min bi- pîrse; ka kî me, di zîkê kîjan nasnameya hût de vexwarî me, di bin bizmarên kîjan qefesa heyîne de zengarî me? Çavên min ji çî ne, guhên min ji çî? Min bipirse êdî, min bipirse! Dilê min gengek berf e yan so- tîkek agir? Ji goşt û xwîne ye yan zîngezinga delodîniya he- bûnê?

Ji min bipirse; min, bi min, ji min bipirse ka ez çî dikim di bin goristana heyatê de? Çima dilê xwe dikolim, li qesr û qo- naxên kurdîtiyê yê xirabe li defa kîjan hewarê dixim? Ji min bipirse ka ez çî dikim?

Çima wiha dikim zimezim li bin asîmanê tî û tîrvexwarî? Çima bi neynûkên xwe keviran dikolim, bi dilê xwe axê? Ji min bipirse, çima hê jî di zaroktiya pêxwas de lêvên xwe dicûm, li deriyê cîranên xerîb dixim û direvim?

Min bipirse, min ji min bi- pîrse, çî ne ev xeyalên ku min li pey xwe dikişîşînin? Ev sêda- rên ji Şêxê Pîran, ev bejnên ku li asîmanê Mahabadê bi biharê xapîyayî wekî desmalên şano- yek şikestî li ba dibin çima dev ji min bernadin? Min bipirse; ji kulîlkên rûçîkandî, çîrokên dîzi- yayî, ji sermestiyên bi guleyên şiyariyê şikîyayî. Min bipirse ji destên nebûnê, kofîya serê pî- rejîne, ji rêya trêne, ji êvara darek bi tenê. Li vir, li wir, li her derê, li ber her deriyê min bipirse. Îmzeyek bavêje binê mirîne, bila jîyan vecîniqê, hesp siwarê xwe dîn bike, kurd aza- diyê xitîm bikin.

Ji min nepîrse. Ne rewşê, ne sibeyê, ne îro, ne niha. Tu tiştî ji min nepîrse. Ger tu bipîrsî jî ez lal im. Wekî kevîrek kurdî yê virvirandî, li bin bîra zeman di- nalim. Qet nepîrse!

'Evinên awira dawî: Navê pîrtûka Walter Benjamin e.

Ji destpêka sedsala 21'an ve, bûyer û karesatên ku li ser mirovahiyê dibar- in, bi tîkiliya faktorên feminîstî tîn pênasêkirin. Wek mînak tî gotin ku di sedsala 21'an de xizanî, penaberî, koçberî, aborî, şidet û diyardeyên bi vî rengî êdî feminîze bûne. Lewre yê ku herî zêde feqîriyê dijîn û bi encamên wê re rû bi rû dimînin jin in. Yê di rêyên penaberî û koçber- riye de herî zêde perîşan dibin zarok û jin in. Beramberî vî yê bi sedem û encamên neyînî yê penaberiyê herî zêde rû bi rû dimînin dîsa jin in. Her wiha rewşa aboriya xerab herî zêde li ser jiyana jinan bandora xwe nîşan dide. Femînîzekirina fe- nomenên sedsala me êdî wek tespi- teke esasî mohra xwe li hemû lêkolînên zanistî û civakî dixin. Ji ber vî yekê ye ku mirov nikare tu mijareke civakî, aborî, dîrokî û hwd. bêyî perspektîfa genderî (zayenda civakî) zelal binîrxîne û ji bo çareser- riya pîrsgirêkan rêbazeke di cih de bibîne.

Yek ji taybetiyên van fenomenên femînîzekirî ew e ku bandora xwe herî zêde li ser jinên başûrê cîhanê (Global South) dike. Diyardeyên ku li jor hatine rêzkirin li welatên di bin mêtîngeriya pergala emperyalîst de ne, zêdetir tîn jiyîn. Bi taybetî di pê- vajoyên şer de ev diyarde bi carekê li ser jinan dibarîn. Lê bi giştî li se- ranserê cîhanê ev rewş xwe nagehe- rîne. Karesat destpêkê li jinan dixê. Gotina 'jin mêtîngeha herî dawî ye' ne bê sedem e. Taybetmendîya du-



Bijan

Munewer  
Azîzoglu Bazan

## Femînîzekirina avûhewayê

yemîn a hevpar a van fenomenan jî ew e ku berpîrsiyarên van bûyeran bi giranî hişmendîya serdest a zilam e. Mêr sedeman derdixînin, jin en- camê dikişînin.

Ligel mijara şideta li ser jinê ku wek 'şerê cîhanê yê domdar' tî bi- navkirin û tu car jî rojevê nakeve, mijara niha ya di rojevê de guher- tîna avûhewayê û bandora wê ya li ser jinan e.

Dema mirov berpîrsiyarên gu- hertîna av û hewayê û yê ku di bin bandora wê de êşê dikişînin bigire ber çavan, hêla wê ya zayendî bi awayekî zelal derdikeve pêş. Lêkolî- nê di vî warê de nîşan didin ku di navbera guhertîna avûhewa û bavîk- salariyê de tîkiliyek heye. Ji zêde- bûna bikaranîna karbondîoksîtê heta xerîdariya bi zanebûn, jî şêlandina çavkaniyên xwezayî heta serdestiya li ser xwezayê, mêr di qirkirina xwe- zayê de roleke sereke dilîzin.

Têkiliya yekser a navbera avû- hewa û zayendên civakî, karesata di rojevê de ye dide der. Ji ber lehî, berf û gemahiya zêde jin zêdetir dimîrin. Wek mînak qurbanên ba- hoza Sidrê ya li Bangladeşê, jî sedî 70 jin û zarok bûn. Girêdayî rolên

zayendî jin an avjeniyê nizanin, an di mal de ne, an jî ber zarok û extî- yaran xwe nadin alî, an jî jî ber ku dereng agahî distînin, dibin qurba- nênan xezêba xwezayê. Her çiqas bandora guhertîna avûhewayê zê- detir li welatên başûrê cîhanê xwe bidin nîşandan jî, jinên bakurê ci- hanê jî jî vî yekê bêpar namînin. Wek mînak jin ji bagera bi navê Katrina ya li DYAYê jî bêtir bi bandor bûn. Faktorên wekî 'xizanî û temen' di vî rewşê de dîsa za- yend û avûhewayê tîne cem hev. Jinên pîr zêdetir jî pêlên germê bi bandor bûn. Her wiha jî ber ku mîrên extiyar hîn baştir di nav vî- vakê de tîn xwedîkirin derfeta wan a xelasbûna jî bandora hişkayî, bager, bahoz û lehiyê bêtir e.

Dîsa lêkolîn destnîşan dikin ku şideta zayendî jî jî ber guhertîna avûhewayê zêdetir dibe. Wek mînak keçîk û jinên ciwan ên ku di demên hişkahiye de berpîrsiyara malbatê digirin ser milê xwe, neçar in ku -ji bo anîna avê an jî kar- biçîn cihê dîr. Û bi vî awayî zêdetir leqayî şideta zayendî tîn.

Ligel tespîta femînîzekirina bû- yerên sedsala me, bi tespîta birêz

Abdullah Ocalan ku sedsala 21'an wek 'sedsala azadiya jinê' dinîrxîne, du nêzikahî derdikevin pêş: Li hê- lekê pênasêkirina pîrsgirêkan a bi jinan; li hêla din pênasêkirina çareseriyê ya bi jinan. Bêguman lêkolî- nê zayendî jî bo tespîtkirina pîrsgirêkan û sedemên wan gelek girîng û pêwîst in. Lê jî hêla din ve ev lêkolîn bi tena serê xwe jî bo afir- randina çareseriyê tîr nakin. Lewre dirûşmeya lêkolînerên zayendî ya jî bo avûhewayê ku dibêjin 'bêyî wekheviya zayendî, wekheviya avû- hewayê nikare bê avakirin' çareseriyê bîngehî destnîşan nake. Lewre me dît ku wekheviya zayendî bi tena serê xwe ne azadiyê tîne, ne jî pîrsgirêkên civakî çareser dike. Ya ku pîrsgirêkên civakî nikare çareser bike dê çawa pîrsgirêkên avûhewayê çareser bike. Ji ber vî yekê ye ku wekheviya divê bê xwestin ne di navbera mirovan de, di navbera hemû hebûnên xwezayê de be. Û ya ku vî wekheviyê dê ava bike, hiş- mendîya jina azad e. Li dijî wekhe- eviya bavîksalarî û karesatên avûhewayê, bi yekbûna xweza û jinê em dikarin sedsala 21'an bikin sed- sala azadiya jinê û xwezayê.

# Bobelat xwezayî bin bergirî çî ne?

Ji hêla dewletê ve tespîta tînin kirin ku bobelat xwezayî ne. Heke tespîta xwezayîbûna bobelatan bê kirin, gelo pewîst nake ku tespîta peywîr û bergiriyên ji bo van bobelatan jî bê kirina

Qedrf Esen

Li bakurê Kurdistanê jî ber mehên zivistanê rojên gelek zor û zehmet derbas dibin. Li gelek deveran berf dibare û şertên jiyane zehmet dike. Di rojên dawîn de ji ber ku berf zêde dibare, rêyên gelek gundên bakurê Kurdistanê hatine girtin û tîkiliya bi kesên ku li gundan dijîn re qut bûye.

Di van rojên zor û zemet ên bi sir û seqem de piştî bobelata erdhejê ya li Xarpêtê, li navçeya

Miksê ya Wanê jî bobelata aşûtê pêk hat. Aşût, li heman cihî 2 caran pêk hat. Aşût, destpêkê di 4'ê Sibata de bi ser dolmîş û weşayêteke kar de ket. Gelek kes di bin aşûtê de man. Di xebatên lêgerînê de 5 kes mirî û 7 kes jî sax ji bin aşûtê hatin derxistin.

## Bi dehan kes mirin

Roja din ango di 5'ê Sibata de dema ku hê xebatên rizgarkirinê didomiyên, cara duyemîn aşût ket. Ji ber ku bi awayekî bê kontrol xebatên rizgarkirinê dihatin kirin, gelek kesên ku tevli xebatên rizgarkirinê bûbûn, di bin aşûtê de man. Dema ku rojnameya me çû çapê, cendirne, cerdevan û kedkarên agirkujê jî di nav de bi gîştî 41 kesên jiyana xwe ji dest dabû. Cenazeyên wan jî bin aşûtê hatin derxistin.

Weke erdheja Xarpêtê, li vir jî bobelat nebû sedema mirina mirovan, bergiriyên ku di dema xwe de nehatibûn girtin, bû sedema mirina bi dehan mirovan. Bi salan e Desthilata AKP'ê bi rê û gêdûkên (tunel) ku çêdike propagandaya xwe dike. Lê li

gel ku navçeya Miksê gelek bilind e û mehên zivistanê çûn û hatina wê zehmet e jî, ji bo pêşgirtina xesarên bobelatên mîna aşûtê tu bergirî nehatine girtin.

## Çay belav kir!

Raste rêya ku diçe navçeyê, li gorî salên berê hatiye nûkirin. Lê li gel ku her zivistan li herêmen ku rê di wan re derbas dibe aşût pêk tê jî ji bo pêşgirtina encamên giran ên aşûtê, teddbîrên pêwîst nehatine girtin. Rê li gorî vê yekê nehatiye sererastkirin. Ev yek jî weke erdheja Xarpêtê, bû sedema êşên gelek giran!

Di saetên ku xebatên lêgerîna kesên di bin aşûtê de mabûn, dihatin kirin de, Serokkomarê Tirk Recep Tayyip Erdogan, li bajarê Kirikkaleye yê Tirkiyeyê mitîng li dar dixist. Di mitîngê de weke ku li welat li laşê mirovan nayê gerîn, Erdogan propagandaya partiya xwe dikir û çay li beşdarên mitîngê xwe belav dikir.

Balkeş bû, televîzyonên Tirkiyê yên ku qaso qenalên nûçe-

yan in jî weşanên xwe yên zîndî yên li cihê aşûtê qut kirin û berê xwe dan mitîngê Erdogan. Li gorî xwediyên van qenalên axaftina Erdogan ji gerîna laşê mirovan girîngtir e. Lewre, axaftina Erdogan heta dawiyê dan.

Televîzyonên ku li ser çûyîna Şaredare Stenbolê Ekrem İmamoğlu ya kaşûnê ya dema erdheja Xarpêtê, bi rojan nîqaş kirin û darsa sincê dan, ji bo Erdogan sinc ji bîr kirin.

## Peywir û bergirî jî hene

Her çiqas dewlet bi bîdengiya xwe û televîzyon jî bi weşanên xwe bixwazin ku bobelatan weke bûyereke xwezayî nîşan bidin jî, êdî tu tişt ji gel nayê veşartin. Kesên ku ji ber negirtina bergiriyên birîndar bun û xizmen xwe di van bobelatan de wînda kirin, baş dizanin ku, bobelat çî ne. Heke tespîta xwezayîbûna bobelatan bê kirin, gelo pewîst nake ku tespîta peywîr û bergiriyên ji bo van bobelatan jî bê kirin?

## KCD'ê şîn îlan kir

Hevserokê Gîştî yê Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Sezai Temellî û Hevserokê Partiya Herêmên Demokratîk (BDP) Keskin Bayindir çûn cihê bobelatê û xebatên lêgerînê di cih de şopandin. Dîsa CHP'ê jî heyetek şand Miksê û tîkildarî îxmalan lîkolîn da dest pê kirin. Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) jî bi daxuyaniyekê ji malbatên kesên ku di bobelatê de jiyana xwe ji dest dabûn re serxaxî xwest û li bakurê Kurdistanê jî bo 2 rojan şîn îlan kir.



# PZK'ê mijara zimanê kurdî bir meclisê!

Navenda Nûçeyan

Liv û tevgera ji bo fermîkirin û pêxistina zimanê kurdî, li Bakurê Kurdistanê zêde dibin. Di meha çileyê de Tora Ziman û Çanda Kurdî, ji bo vê yekê li Amedê bi beşdariya 300 kesî komxebatek li dar xistibû. Di vê komxebatê de biryar hatibû dayin ku xebatên ji bo parastin û pêxistina zimanê kurdî bîn geşkirin. Ji bo vê yekê bang li partî û sazî û dezgehên kurdî hatibû kirin ku hewldanên xwe yên di vê derbarê de zêde bikin.

Piştî vê komxebata Tora Ziman

û Çanda Kurdî, Platforma Zimanê Kurdî (PZK) jî zend û bendên xwe bada û berê xwe da Enqereyê. Platform, di sala 2018'an de bi beşdariya 9 partiyên bakurê Kurdistanê hatibû avakirin. Ji roja ku hatiye avakirin heta niha gelek civîn li dar xistiye û banga geşkirin û zindîkirina zimanê kurdî li kurdan kiriye.

## Kurdîbûna siyasê

Piştî van bangên xwe, platform cara yekemîn bi awayekî şênber ket nav liv û tevgerê û bi partiyên siyasî yên Tirkiyeyê re dest bi hevdîtinan kir. Ji bo vê yekê di 4'ê Sibata de endamên platformê li Meclisê,

serdana Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) kir. Platformê, daxwazên xwe yên fermîbûna zimanê kurdî û kurdîbûna zimanê siyasê pêşkêşî HDP'ê kir.

Parlementerê HDP'ê yê Amedê İmam Taşçier, tîkildarî hurgiliyên serdanê axivî. Taşçier, diyar kir ku Platform dixwaze li cem zimanê tirkî zimanê kurdî jî bibe zimanê fermî yê duyemîn û ev tişt got: "Ji me jî daxwaz dikin ku zimanê siyasê bibe zimanê kurdî, yanî parlamenterên kurd bi kurdî bi axivîn û kurdî derxin pêş."

## Daxwaz pêşkêş kirin

Endamên platformê piştî serdana xwe ya HDP'ê, serdana CHP, Partiya Saadetê û endamên Yekîtiya Ewropayê (YE) jî kirin. Platformê, di serdanan de daxwazên xwe hem bi nivîskî hem jî bi devkî radestî partî û endamên YE'yê kirin.

Paltformê, tîkildarî serdana xwe ya Enqereyê û hevdîtinên ku li Meclisê bi partiyên siyasî re kir, di 7'ê Sibata de li Avahiya Partiya Azadiya Kurdistanê (PAK) ya Amedê, civîna çapemeniyê li dar xist. Di civînê de Berdevkê Platforma Zimanê Kurdî Şerefxan Ci-

zîrî tîkildarî serdanên wan axivî. Cizîrî diyar kir ku xwestine bi hemû partiyên ku li Meclisê ne re hevdîtin pêk bînin lê tenê HDP, CHP û Partiya Saadetê deriyên xwe ji wan re vekirine.

## Bi qursan çareserî nabe

Cizîrî, destnîşan kir ku hewl dane bi AKP'ê re jî hevdîtin pêk bînin, lê AKP'ê bersiv nedaye daxwaza wan a hevdîtinê û tîkildarî naveroka hevdîtinên wan ev tişt anî ziman: "Me di hevdîtinan de daxwazên xwe yên ji bo zimanê kurdî pêşkêşî partiyên kir. Me ji wan re got meseleya zimanê kurdî tenê bi qursan çareser nabe. Divê zimanê kurdî bibe zimanê fermî û divê Saziya Zimanê Kurdî ava bibe. Serokê Gîştî yê CHP'ê Kemal Kılıçdaroglu piştgiriya daxwazên me yên ji bo Saziya Zimanê Kurdî kir."

Endamê Platformê Vahit Aba jî, da zanin ku piştî van hevdîtinan xwe, nexşerêyek dane peşiya xwe û wiha got: "Em ji bo 21'ê sibata xebatekê dikin. Piştî re jî em ê di 22'ê Sibata de konferansekê li dar bixin û bernameya xwe ya salekê diyar bikin."

## Şerê Vîrusa Coronayê

Mehmet Ali Ertas

Di dîroka mirovahiyê de piştî pergala dewletiyê hat avakirin, şerê di navbera serdest û bindestan de bi hezaran salin didome. Dewlet, ji bo serdestiya xwe xurt bikin, her tim serê xwe li ser taktîk û rêbazên şer pir êşandine. Her tim amancên wan ên ku li hember 'Ên Din' serbîkevin, bêtir axê tîxin serweriya xwe, kole û xulamên xwe zêde bikin hene. Gelek dewlet hatin avakirin û hilweşiyên. Gelek împarator hatin û çûn. Sultan, paşa, beg û mîr hatin û çûn. Lê civak her heye.

Ev şer şerê serdest û bindestan e. Şerê hebûn û tunebûnê ye. Şerê serweriyê iro bi çekên cuda, rêbazên cuda û politikayên cuda yên taybet tê meşandin. Hin caran El Qaideyê, hin caran DAIŞ'ê, hin caran bi hêzên weki HTŞ, OSO, hin caran bi GDO, hin caran bi Esrar, Eroin, hin caran bi nexweşiyên Şewb, Vîrus Veba û niha jî bi Vîrusa Corona şer dikin. Di hefteyên dawî de jî Vîrusa Corona pêş xistine. Lê weki ku ji mar û mişkan belav bûbe nîşan didin. Gelo bi rastî ev nexweşî çawa belav bû. Çima li Çînê belav bû. Bi rastî jî dermanê wê tune?

Şer, serdestî û bindestiyê, zîlm û zordestiyê, înkâr û îmhyayê tîne. Şer koçberî, talankirin, wêrankirin, xerakirin, kuştin, îşkence û êşan tîne holê.

Nexweşiyên zêde dike. Êşên bêtarîf ava dike. Malbat tar û mar dibin. zarok tînin kuştin, mirov tînin şewitandin, xanî tînin xerakirin. Bombe û gule dibin baran û ji ezmanan dibarin. Çav û guhên welatên cihanê kor dibin. Bi koranî temaşe dikin. Her ku şer geş dibe bêtir gule tînin firotin. Her ku şer pêş dikeve şirketên bazirganên silehan bêtir dewlemend dibin. Betalî, koçberî û bêwarî zêde dibe. Mirov bêtir bêpergal û bêmal dibin. Bêtir bêdebar û bêyar dibin. Xizanî û nezanan zêde dibe. Bawerî û bêbiryarî lal dibe. Bazirganên şer dixwazin, mirovan bêper û bêbask, bêziman û bêstar û bêparastin bihêlin. Ne dikarin xwe ji nexweşiyên, ne dikarin xwe ji xizaniyê û ne ji dikarin xwe ji şer biparêzin. Lê nizanin ku çavkaniya hebûna xwe tune dikin. Beden û jiyana xwe tune dikin. Nizanin ku bi tunebûna "Ên din" "Xwe" tune dikin. Tunekirina ziman, çand, xweza, av, ax û hewayê, tunekirina hemû mirovahiyê ye. Tunebûna serdestan e. Lê ka ew çav û ziman. Ka ew aqil û hizir...

Ji şerê çekdarî aqil negirtin, ji şerê îqtidarê, şerê kimyewî, şerê biyolojîk, şerê nukleer aqil negirtin. Çav kor bûn û vî carê vîrusan belav dikin. Ne El Nusra û El Qaide, ne DAIŞ û ne ji karasetên cihanî hişyar kirin. Çav kor kirin û gotin vîrus ji mişk û maran belav bûye. Lê rastî çiyê?

Dibe ku iro hêzên serdest vîrus belav kiribin. Çawa ku DAIŞ li Rojhilata Navîn belav kirin û qada şer vekirin, iro jî bi rêya vîrusa Coronayê bi sedan mirovan jiyana xwe ji dest dan. Tenê li Çînê zêdetirî 500 welatî bûn qurbana vîrusa Coronayê. Zêdeyî 24 hezar mirov jî bi nexweşiya vîrusê ketine.

Bi taybetî şer li Sûriyê û li ser serê Kurdan zêde dibe. Di vî şerî de herî zêde kurd, tirk, ereb, ermenî, keldanî û suryani jiyana xwe ji dest didin û koç dikin. Dema mirov pirtûka Nivîskar Jared Diamond a bi navê "Tifing Mikrop û Pola (Tufek Mikrop ve Çelik)" dixwîne, fikara ku iro vîrusa Corona bi destê serdestan belav dibe bêtir nêzi aqilan e.






## DAYIK ERD E Û DENGÊ DAYIKÊ ZIMAN E, ZIMAN JÎ KURDÎ YE

## Çîrok û çîrokbêjî huner e

→ Bêrivan Matyar

Radizem jî folklor di devê min da ye û di serê min da ye. Weka gundekî, li ber te baxçê şengîn vedibe; her naz û nîmet tê da heye û geşayî tê da heye. Tebîfet jiyandar e, dewlemendiyek ecêb e

CELÎLÊ  
CELÎL  
kî ye?

Nivîskar, lêkolîner, zargotîznan û dîroknas Celilê Celilî, di sala 1936'an de li Êrîvanê hatiye dinyayê. Celilî li Zanîngeha Yêrîvanê û rêkxistîya rojhilat-nasiyê ya Lenîngradê xwendiyê. Di sala 1963'an de profîya xwe ya di warê kurd-nasiyê de wergirtiyê. Paşê ew li welatê Nemsayê bi cih bûye û li Akademiya Zanistî ya Nemsayê xebitiye. Celilê Celilî heta niha nêzîkî 40 pirtûk nivîsandine. Ji van pirtûkan 20 heb bi zimanê kurdî nivîsandine. Pirtûkên wî li zimanên rûsî, ermenî, erebî, tirkî û zaravayê soranî hatine wergerandin.

Prof. Dr. Celilê Celilî di rêya zanist, dîrok, wêje û folklorê da gelekî xizmet kiriyê. Lê hevpeyvîna me dê li ser qonaxa folklorê be. Serê ewil em malavahiya we dikin ku we deriyê pirtûkxaneyê Prof. Dr. Casimê Celilî li me vekir.

**Ji ber ku em niha li pirtûkxaneyê Casimê Celilî ne, pirsê me ya ewil li ser Prof. Dr. Casimê Celilî ye. Hûn dikarin ji me ra hinek behsa bavê xwe û avakirina pirtûkxaneyê wî bikin?**

Ez zanim ji gund revîyane û piştî revê jî di sêwixaneyê da mezin bûne. Bavê min tim behsa zaroktiya xwe dikir. Bavê min heşt salî bûye, berxvan bûye, bilûrê jî lê daye. Bavê min pêşeka elektrîkê distîne, piştî xilas dike. Îcar komsumol dişîne Bakûyê. Dibistanê leşkeriyê çar salan dixwîne. Ji wir jî dişînin Tiflîsê ji bo zabitiyê. Wexta li Bakûyê bû elfabeya kurdî çêdibe û dixwazîna kitabên resmî yên kurdî amade bikin. Kadro tune bûn. Yê ku elifba çêkir bavê min nas dikir. Ji bavê min re name şandibû. Bi vî awayî bavê min dest bi xebatên kurdî dike û hîmên wan xebatan datîne. Paşê weşanxane vekirin û gazî bavê min kirin ku bavê min kitêban çap bike. Ji rewşenbîran ê ku mala wan hebû mala me bû, mal dabûn bavê min. Çimkî weşanxane spartin bavê min.

Wê çaxê min li sê ciyan kar dikir; hem unîversîte, hem akedemî hem jî enstîtuya pedagojîyê. Min hinek tişt dan hev heta du salan kişand. Her carê min tiştê dikir, tiştê din dima. Paşê jî ev tişt, ev tişt. Hêdî hêdî min ava kir. Min çêkiriye, min hazir kiriyê, ev e pîrvat e. Kes nikare bibêje min pere daye û çêkiriye kadro jî ji malbatê ye. Heta min par jî kevirê dîwêr daniye. Dîwarê lê kir. Min tonêk, hezar kîlo kitêb ji Yêrîvanê bi teyarê şand û ez hatim, min girt. Arşîva min pir e; mektûbên gelek girîng hene; salên 60'î Bedîrxan ji min ra name nivîsiye, yê din nivîsiye.

Niha jî ez li ser internetê li kitêban dinêrim û dikirim. Lê kitêb gelek in lazim e, hûn bigihînin me. Li ser kurdan çî kitêb çap dibin, hûn bigihînin min. Ez îro heme sibê tune me. Lê bira li vir hebe tîjî be. Ez tîm dibêjim; çî qas giran be ew qas çetîn e xerakirin.

**Prof. Dr. Casimê Celilî ne tenê pirtûkên zimên û folklorê çap kirine. Yê der barê siyasê de jî çap kirine û yek ji wan "Manifestoya Kominîsta" ye. Gelo ew pirtûk jî bi kurdî hatibû çapkirin û ew jî li vir e? Dibe ku îroj mirov ji nû ve çap bike?**

Erê, gelek kitêbên bi kurdî hene; ya Marx, ya Engels, Kapîtal jî heye lê şaxek biçûk e çimkî Kapîtal mezin e. Robînsan Crusoe, Tolstoy ji wan tiştên biçûk dîsa bi kurdî hene, hatine çapkirin. Lê îroj bazara wan tune ye lewma kes ji nû ve çap nake, kesekê ku xwe bide berê hebe, ez ê bihêlim bira çap bikin. Heger weşanxaneyek hebe çap bike, dê baş bibe.

**Di arşîvên Osmanîyan û hin arşîvên biyanîyan de li ser nexşeya dinyayê çîhê Kurdistanê heye. Prof. Dr. Casimê Celilî jî yekemîn bi kurdî nexşeya dinyayê çêkiriye. Hûn dikarin ji me ra behsa wê nexşeyê bikin? Di wê**



Wêne: Mamo Issa

**nexşeyê da jî çîhê Kurdistanê heye?**

Ev nexşeya dibistanê bû, ji bo zarokan, şagirtan bû. Zarok jê cografîya hîndibûn. Bavê min nikaribû Kurdistanê nexş bike. Çimkî ermenan wê çaxê digot, ew erdê me ye. Ew dewlet bûn, em bindestê wan bûn. Tiştên wisa nedihîştin. Sovyetê jî nedihîşt nasyonalîzm çêbibe.

**Bingeha avakirina wê pirtûkxaneyê li ser kîjan esasan e? Pirtûkên ku di wê pirtûkxaneyê de ne, tev li ser kurdî û Kurdistanê ne?**

Du şertên girîng hene; yek bi zimanê kurdî her tişt heta kitêba dibistanê, ji bo dersan. Bira încel be bira quran be. Ya din jî; bi hemû zimanan li ser kurdan çîqas pirtûk, rojname, kovar hebin li wê kitêbxaneyê hene.

**Me dil kir ku em biçin Erîvanê, mala Prof. Dr. Casimê Celilî û serdana Cemîla Celilî ku xebat û keda wê jî nayê gotin, lê li hev nehat. Em dixwazîna hûn ji me ra hinekî behsa wê jî bikin?**

Her du xwişkên min jî di meşa me da ne, Zînê jî gelek kar kiriyê. Tercûman e; li Unîvesîteya Moskoyayê li ser navê Maksîm Gorkî xilas kiriyê. Vê çaxê jî kurdan sê kes wê derê xilas kiribû; Mîkaîl Reşîd, kurê Emînê Evdal û Zîna xwişka min. Kitêb ji kurdî wergerandine rûsî û zimanê lî-tovî. Kitêbek ku efsûn û çîrokên kurdî bûn, Zînê wergerandibû rûsî û me ew çap kir. Paşê jî rûsî wergerandin şex zimanên din û çap kirin. Zînê par kitêbek din jî çap kir. Cemîla zaten muzikolog e û di radyoya Yêrîvanê da xebitiye. Bîst û pênc kitêbên wê hene. Wexta ez klaman tînim, Cemîla dike nota. Niha jî xebateke wê heye; 13 stranên botî bi nota dike.

**Hûn dibêjin ku, "Di mirovan da mora qedêrê ziman e" û "ya ku ziman xwedî dike folklor e." Hûn dikarin ji me ra behsa wêya bikin?**

Folklor çî ye, dengê kal û bavê me ye. Wextê çîrok dibêjin, çawa bi-hîstine na, ne tenê deng. Bi çî merîfetî dibêjin. Kulfetek hebû, min jê dinivîsî paşê kurê wê mezin bû. Digot "ez jî çîrokan dizanim bibêjim, dêya min ji me ra digot. Dêya min jî bîr kiriyê lê tê bîra min." Dest pê kir û got lê helbet çawa dêya wî digot wisa nikaribû. Digot û digot lê dêya wî navbêrî kir û got "tu çawa dibêjî? Hinekî zindî bibêje, xweş bibêje." Çîrokek ku min qeyd kiriyê û

nivîsiye, di arşîvê da heye. 35 rûpela A4 e. Wisa têr û tije û dagirtî ye. Lê Cemîla xwişka min wê çîrokê rûpel û nîvek qeyd kiriyê. Way min got ev çî derb bû, xençerek bû, ciwanîya wê çîrokê tune ye. Gotiyê: "Dêw hat, dît yek rûniştiye, şûrê xwe derxist û lê da..." Lê çîroka din dibêje: "Ha haaaa! Çêjikê kurîşanooo! Waa çend sal e, ez li hêviya te me. Bîrîna diranê mi naka wê qenc bibe. Tî dikevî ber diranê mi, ez texmîn jî nakim ti ketiyê ber derê min jî. Toz û dûman rabû, firtûne rabû, dinya li hev ket. Gotin çî bûye çî nebû, dinya xera bûye? Gotin filankes e hatiye..." Çîrok, çîrokbêjî hûner e, hûner nema ye. Ziman feqîr bûye, fantazî tune ye.

Tiştêk din jî ku di destanan da jî heye. Wexta dengbêj distran, xanim jî li jorê di odayên xwe da dibihîstin, kulfet hene, qîz in, met in, qîzmet in, cînar in lê nikarin werin civata dengbêjan. Ew jî ji mîrê xwe ra dibêjin "Îcar dora me ye, bira bê ji me ra bistrên." Îcar ew dengbêj rojek du roj jî diçû cem wan bistrê. Îcar zarokên me hişyar bûne û dibêjin folklor lê folklor nemaye. Ew filosofîya ye, zîmanê kurdî ye, helbest e. Li Colemêrgê derwêşek hebû min ji wî gelek tişt qeyd kirin; yê sîfîyan bûn. Kurdî ne, helbest in, zarkî ye, zardîlî ye.

Erd heye, deng jî kurdî ye. Dayik erd e û dengê dayikê ziman e, ziman jî kurdî ye. Dê erd e ku şîr dide me, şîr jî bo zarokan çî ye; av e, xwarin e, jîyan e. Zarok heta mezin dibe hezar tişt dixwe. Ew jî ziman e ku dîsa ji dayikê tê digihîjê. Ew tişt heta silsilê diçe lê dayik dimîne.

**Hûn dibêjin ku "Em li ser xezîneyê ne û ew wînda dibe, binax dibe û mişk dixwe." We têra xwe berhevkarîya folklorê jî kiriyê. Lê gelo hûn dîsa jî bi wê diêşin?**

Haaaa! Pê diêşê hindik e. Xewa min direve. Ez niha dizanim, mesele tê ser kîjan mijarê, bîrîna min vedibe. Ez îro jî şiyar bûm û min got Kurdistan li wir e, kurd li wir in, folklor li wir e û ez li vir jî xew şiyar dibim. Dîsa pê êşiyam. Xelk êdî xwe bi xwe ra nastrê, civak(t) tune ye, perçe heye. Berê bindarok hebûn, diçûn malên hev, ber tevnê rûdiniştin hezar gilî hezar gotin. Min digot ez ê li wê derê, li baxçe tendûrek çêbikim bira kurd, kulfet werin. Ew ê arê min jî hebe, nanê xwe bipêjin, li gorî min jî min ra jî bipêjin. Îcar ew ê baş bibe. Min jî kê ra got lê

kes xwe nade berê, hewl nedan. Dê hinek şabûn jî hebûya. Lê wekî tendûr hebe, nanê kurdî hebe. Ka ji viya çetîr çî heye. Yanî tune ye, tune ye.

Ez xwe hêsan dikim li ser folklorê. Radizim folklor di devê min da ye û di serê min da ye. Weka gundekî, li ber te baxçê şengîn vedibe, her naz û nîmet tê da heye û geşayî tê da heye. Tebîet jiyandar e, dewlemendiyek ecêb e. Folklor jî ji bo min wisa ye. Wextê dicivin, ez dibêjim ya rebî ez nagihînim. Ev jî zane, ew jî zane. Ez zanibim, çiyekî xezîneyek hebe ez ê herim, li wir bimrim jî ez ê herim.

**Em dizanin ku hûn piştî sovyetê cara ewil çûne rojavayê Kurdistanê û berhevkarîyê kiriyê. Niha jî hûn dixwazîna berhevkarîyê bikin û her carê keysa we çêdibe, hûn berê xwe didin bakurê Kurdistanê û berhevkarîyê dikin. Dema mirov jî aliyê folklorê ve bide ber hev, her du alî cudahiyan dihevin gelo?**

Suriye, weka wextê yek nexweş dikeve dişînin rehabilitasyonê, ji bo ku bê ser hişê xwe û bi derman birînen wî bikewitînin. Suriye rehabilitasyon bû ji aliyê çanda kurdî, zimanê kurdî ve. Tije bû, xurt bû, poet jî hebû; helbestkî bûn, bi kafî bûn. Îcar min sê cild hazir kiribûn. Yek jê jî pexşan bû. Tradîsyonên wan hebûn. Heta salên 90'î, ji wir pê ve êdî yanî di sedsala 21'ê min de gelek awayên siyasî çêbûn.

**We gelek destanên kurdî ji zarbêjan guhdar û qeyd kirine. Destana ku herî zêde tesîrê li we kiriyê, ya hûn herî zêde ji hez dikin kîjan e?**

Tu zanî çî ye, (dikene) ev pirseke balkêş e lê bersiv lazim e. Îcar nas û cînanan ji dêya min dipirsîn; "Xanim tu herî zêde ji her çar zarên xwe ji kîjanê hez dikî?" Dêya min digot "Ew çar tilî ne, her çar zarên min in. Tu yekî jê bikî, birîn bikî ferqîya êş û xwîna wan çî ye? Êşa wana gişka ye e. Heger birîn bûn, her çar tilî jî weka hev diêşin. Zarokên min ji wisa ne." Naka her destanek cewahîrek e. Wan cewahiranan torekê çêdikin. Awa zengîniyek pir mezin a çandê ye. Tu yekî derxî; Mem û Zîn derxî kême, Cembelî derxî kême. Destanên mîrxasî û evîniyê hene û tev bûyer in.

**Hûn dikarin behsa projeya xwe ya "Bîst û Pênc Cildên Zargotîna Kurdan" bikin? Dê her cûreyên zargotînê tê da çî bigirin? Yan jî ew ê berhevkarîya we ya salên dawîn jî dê têda hebin?**

Me civandiyê û naka ez ê 25 cildan çap dikim. Me heşt cild çap kirine, naka dîsa du-sê cild amade dikim. Zû zû dikim çimkî êdî ji min ra wext nemaye. Ez bigihînim 25 çap baş e. Ku zêde be hê baştir e. Destan in, hem navên dengbêjan hem fotoyên wan ên bi rengîn hene. Ji bo ku her kes gelê kurd nas bike; welatê wan, cografîyaya wan. Mesela destana kela dîmdîmê bi fotoyên rengîn e. Bira mî-mariya Kurdistanê zanibin. Wênayên Keleha Colemêrgê dused sal berê û wênayên dewra me jî hene. Dixwazîna şopa kurdan hinda bikin lê wisa şopa kurda hinda nabe. Du cild, stranên mîraniyê û şeran, du cildên kamil çîrok in. Cildek heyranok jî, du cild jî govend, cildek ya şînê jî heye.



# Êşa zimanê kurdî-3-

Zimanê kurdî bi bişkivandina gundîtiyê û rûbirûmayîna bajarên re ketiye dest û lepên êşeke giran. Kifş e ku heta di bajarên de nebe zimanekî serwer, zimanê perwerdeyê, zimanê bazarê êş wê dewam bike

Yaşar Eroglu

## Pirsgirêk çawa der dibin?

1- Li Kurdistanê perwerde û ragihandinê bi sedhezaran xwendekarên ji çar heta bîst û çar salan zimanê tirkî ji zimanê dayikê qenctir, rêkûpêktir diaxivin gihandine. Xetereya herî mezin a zimanê kurdî dibişeve ev e. Zarokan ji ber pêsîra dayikên xwe digirin, bi tirkî perwerde dikin. Mêjiyê dilmeyî tirkî fêr dibe, dide pêş, qada bikaranîna kurdî teng dike û paşê davêje. Hemû xwendekar gava li kurdî vedigerin tirkî difikirin, kurdî diaxivin. Mantîq û hevoksaziya tirkî û kurdî cuda ye. Lê belê bi kurdî qet perwerde nebûne, zimanê dayikê tenê carinan li mal tê axaftin. Gava ku bi hevoksazî û rêzimana tirkî re rû bir û dimînin çî dizanin tevlihev dikin. Pîrî caran jî, ji ber qelsbûna kurdiya wan nikarin xwe îfade bikin û xwe davêjin peyvên tirkî. Ziman wêga birîndar dibe, pêşeroja wî dikeve xetereyê, êşa wî girantir dibe. Berê, pêşî bi kurdî difikirin, paşê werdigêrandin tirkî. Îro bi tirkî difikirin, paşê werdigêrandin kurdî. Kurdî li bajarên, ji ku derê tê ku derê? Wêga li ku derê dimîne gotina; ‘zarok û ciwan pêşeroja ziman in?’

2- Li bajarên her kurdek dorhêla zimanê tirkî yê bazarê, ragihandinê, perwerde û zimanê fermî lê ferz e ku jiyana xwe debas bike. Li eczexaneyê, kirtasiyeyê, wesayîtan û ên din lê ferz dibe ku tirkî biaxivin. Axaftina bi tirkî her roj ji roja din zêdetir asayî dibe û qasekê şûnde nikarin xwe ji vê çerxa teng derxînin, dibin elemanê tirkîaxêv. Heta zarokên wan ên xwendekar jî dibin berdevkê asimilasyonê yê malbata xwe.

3- Pêdiviyên nû ku li gundan hewceyîya wan tune ye, li bajêr berê kurdan dida zimanê biyanî. Nexweşxane, qada finansê banke, perwerde, karmendî, telefonsazî, pişesaziya piçûk û mezin, internet, poste, ehliyetsazî û gelekên din bi xwe re têkiliyên nû diafirînin. Zimanê bajêr nivîskî ye. Zimanê nivîskî bi tirkî ye. Zimanê nivîskî razber e. Kurdên bi van sazîyan re rû bi rû dimînin jî, yên ku di van sazîyan de bixebitin jî li wan ferz e ku di bêjîngê vê têkiliyê re derbas bibin. Termînolojiyê nû dinase. Zimanê kurdî yê şenber ku bi piranî bi simbol û hêmayan tedi-gihîşt, niha zimanê nivîskî pêşberî wî ye. Mecbûr e xwe li gorî wî deforme bike. Zimanê şenber (gundewar) bi zimanê razber (bajar-nivîskî) re derdikeve ser mîndera gulaşê. Berê li ber xwe dide lê dawiyê li ser mînderê dimîne.

## Psikolojiya li bajarên û kurd

4- Zimanê bajêr psikolojiya kurdan bi aliyê xwe ve veguhas-tiye. Kêma zêde beriya sed salan tirkî dihatin gund, heta bajarên (ji ber ku bajar pir piçûk û nîvêniv tîkîlî gundewar bûn) demekî diman tirkî jî bir dikirin. Alpaslan Turkêş di saxiya xwe de wek xetereyê li pêş tirkan ev yek derpêş dikir. Di dîrokê de gelek mîrekîyên tirk ên li Kurdistanê bûne kurd. Lê ji ser-



dema nivê sedsala bîstan vir ve, li bajarên kurdan ev yek berevajî bû û hejmareke zêde kurd, nazme li bajarên nêzî sînora êdî ji kurdên hatin şuştin. Ji xeynî rastiya xalên li jor, ev rewş yekser bi psikolojiya kurdan ve girêdayî ye. Kurdên ku ji gund diqetin bêparastin û biyani-yên bajêr, nezan in jî. Dinya ku li dû xwe hiştiye piçûk, a li pêş xwe mezin, kêrhatî û medenî dibînin. Di kûraya hişê xwe de vê yekê wisa qebûl dikin. Hingê çand û zimanê kurdî di hiş û mêjiyê wan de têk diçe. Pûte bi tirkî, jiyana û tîkîli-yên bi tirkî tîne. Serê pêşin bi wan re li hev nekin jî bi demê re adaptasyona bi tirkî re, bi ser di-keve. Ji kurdî şerm dikin, ji cil û bergên kurdî direvin. Bi taybetî jinên ku li gundan hatine çewi-sandin, hawireke serbesttir dibî-nin û zû ji kirasê berê derdikevin û ji aliyê kurdî ve bandoreke ne-yînî li malbatê jî dikin. Jinên ber-malî derdikevin sûkê dixwazin bi ziman û çanda kurdan neyên nasîn. Jiyana di TV'ê dibînin xeyal dikin. Dayikên ku berê bin-geha zimanê kurdî bûn li bajarên bi vî awayî vediguherin.

5- Perwedeya rêxistinîrî û bajar genetîka ziman xira dikin. Zimanê kurdî û tirkî du malbatên jî hev cuda ne. Kurdî ji malbata îndo-ewrûpa, tirkî ji malbata ûral-altay e. Avabûn, hevoksazî, mantîq û hikariya wan bi temamî cihê ne. Kurdî hê bi serê xwe û bi dinamî-kên navxweyî zimanê bajarvaniyê pêk neaniye. Zimanê tirkî hem zimanê serdest hem zimanê fermî ye û perwerde, ragihandin, bazar û cur bi cur tîkîliyên jiyana pê çêdi-bin. Zimanê şenber û razber li bajêr li hember hev in. Malbat nikare bi bajêr re bigihîne lewra veguhestina bajar dike, yekser li malbatê deng vedide. Bingeh û sitargeha zimanê kurdî malbat e. Her tişt li sûkê diguhere li malbatê di-kele. Bi bandora vê yekê bivê ne-vê malbat û ziman jî diguherîne. Her tişt li gorî zimanê tirkî teşe digire. Hevokên kurdî dişibin hevoksaziya tirkî. Bajar û tirkî, taybetiyên zimanê kurdî zayend, xwerûtî – te-wangê û ergatîviyê li hev diqeli-bîne, dirûvekî nû dide ziman. Ciwanên malbatê pêşengiyê dikin, bav û dê nikarin xwe jê ragirin. Di dewsa bixwîn ‘yêmiş’ dikin, tê bi-

gihîjin ‘anlamış’ dikin. Di dewsa, ‘min sev xwar’ de dibêjin, ‘min sêvan xwarim, min gotim, ez kirim, ez dîtîm, me wan nedît, vî mehê pir germ e, ji min re ev îs-kanê bîne...’ bi bezaran mînak hene. Bikaranîna bi vî rengî êdî rû-niştîye. Em ji hinekan re bêjin, ‘Diyarbakır Dicle Üniversitesi Fen Fakültesi’ wergerînin kurdî weke ‘Fakulteya Fenê ya Zanîngeha Dicleyê ya Diyarbakîrê’ bi giranî bi ser nakevin, nikarin pêk bînin. Genetîka ziman bi vî rengî xira dibe, eger ew pêk hat ziman jî yek-ser xira dibe.

6- Parastina ziman û zimanê nivîskî yê kurdî bi serê xwe teqez nabe çare. Ji sala 1898’an vir ve bi rojnâmeya Kurdistan hewldaneke zimanê nivîskî ya kurdî heye. Heta îro jî di bin zext û qedexeyan de ye. Ji salên 90’î vir ve bi riya weşan, çapemenî û amûrên çandî-wêjeyî sekneke zimanê kurdî berfi-reh bûye. Ev sekn nazme li hember politikayên bişavftina zimanê kurdî bi biryar bûye. Helbet derketina ji zimanê gundewar a ber bi zimanê ramandina razber ve, ji bo zimanê kurdî gaveke pir girîng e. Berî her tiştî weke pêşevanên xwe, ev gaveke bi hişmend û zane-bûn e. Berfirehtirbûna vê gavê bandora wê zêdetir derdixe pêş. Ev hewldan digihîje destê girseyeke mezin. Hewldanên berê tenê bi rewşenbîran re sinorkirî diman. Zimanê nivîskî jî bo mayîndebûna zimanê kurdî jî pir girîng e. Zimanê kurdî dikeve qonaxa ramandina razber û riya bajarvaniya nav-xweyî vedibe. Ev gava girîng jî hel-bet di bin bandora vê pêvajoya me diyar kir de dimîne. Her çend ku elemanên qada ziman bi hewldanên xwe gihîştîbin jî, yên ku di wê qadê de dixebitin ji perwerdeya zimanê tirkî re derbas bûne. Xira-bûna ziman bi wan re jî didome. Zimanê nivîskî berfireh di qada TV, rojnâme û çapemeniya kurdî de tê bikaranîn. Ajansên kurdî pi-ranî jî tirkî wergerê dikin. wergera pêkhatî pîrî caran ji ruhê kurdî dûr dikeve. Xwezaya kurdî kêma di-mîne, zimanekî çêkirî derdikeve pêş. Tewang û hevokên ergatîvî bi mantîqê tirkî tîne sazînin. Saziyên weşan û çapemeniyê rêbazên xwe yên cuda dişibînin xwînerên xwe. Her yek gelek hişk tevdiqere û ji

ya xwe nayê xarê. Her yek bi serê xwe mîrekiya xwe diparêze! Di navbera wan de standardek nîn e. Dewsa ku ziman bi rû û pêk be, tevlihevî, sergêjî, sersarî xwe li pêş xizmeta ziman dixwe. Ziman jî nav xwe derbeyeke giran dixwe û êşa ziman zêde dike.

## Encam

Di vî nivîsa me ya dirêj de encamên berbiçav derketine rastê. Serê pêşin jî bo zimanê gundewar li hember zimanê bajarvaniyê angoyî zimanê razber pêşerojê ronî tune ye. Heta tora zimanê bajarvaniyê bi gelek amûrên nûjen xwe gihan-diye gundan jî, destê xwe kiriye qirîka zimanê gundewar.

A duyemîn, zimanê bajarva-niyê (tirkî) zimanê gundewar (kurdî) hê jî nikariye tîk bibe lê belê dorteng û bêhîçkandî kiriye. Zimanê kurdî di bin zext û dijwa-riya hezar salan, nazme li gel zexta, înkâr, asimilasyon û tunekirî-nê hebûna xwe heta îro parastîye, zimanekî berxwedêr e. Koka wî xurt û saxlem e. Berxwedêriya wî bi saya zimanê gundewar de qewi-miye. Zimanekî tenê sed sal in bûye serdest, hêza wî tîrê nekiriye zimanekî rehên wî gihîştîne 4-5 hezar salan bikaribe tîk bibe. Lê şert û merc wiha dewam bikin ev yek nikare heta dawî bibe misoge-riya tîkneçûna zimanê kurdî.

A sêyemîn, zimanê nivîskî yê kurdî heta dereceyekê kurdî paras-tiye û weke arşîv misoger kiriye. Lê belê di nav xwe de bi pîrsgirêk e. Hê nikare xwe weke zimanê gel ê sivik û rewana veguhêze, xav e. Hê jî gelek kêma xwe dispêre ka-niya zimanê kurdî; biwêj, gotinên pêşyan, xwezaya zimanê zargo-tinê û ji ruhê zimanê bav û kalan dûr e. Ne teqez e, bi nîqaş e û bêh-neke giran a wergera tirkî jê tê.

A çaremîn, zimanê kurdî bi bişkivandina gundîtiyê û rûbirû-mayîna bajarên re ketiye dest û lepên êşeke giran. Kifş e ku heta nebe zimanekî serwer di bajarên de, zimanê perwerdeyê, zimanê bazarê yanî weke zimanê razber xwe jî nû ve pêk neyne, êş wê dewam bike. Bi wê namîne, bajar û heta gund wê bibin go-rîstana kurdên zindî ku êdî yên bûne melez, teqlît û bê nasname lê dijîn. (dawî)

Ziman û Raman



Samî Tan

## Hestpêkirina surîştî

Ziman wekî diyardeyekê jî hêla zimannas-an ve wekî berhemendiyê mirovan, wekî kargîrî û berhemeke mêjiyê mirovan tê pênasekirin. Her wekî çawa balinde dişên bifirin, mirov jî dişên bipeyivin, ev şiyân û şekirina mirovan, xisleteke wan a surîştî ye. Ev behremendîya xweserî cisnê mirovan, di nava hawirdora zimanekî da dema ew kes tûşî deng, bêje û hevokên zimanekî dibe, îcar li gorî zimanekî teşe digire. Lewre jî dema yek zimanekî piştî hîn bibe, çendî hewl bide jî nikare bi qasî zimanê(n) xwe yê(n) pêşin rewana û pehtî bipeyive. Xencereya wî li gorî denganiya zimanekî teşe girtiye, lewre jî dengên zimanên nû wisa bi hêsanî nikare derxe.

Ji ber vê yekê zimanwergirî û fêrbûna zimanî jî hev tîne cudakirin. Zimanwergirî bi awayekî surîştî, di derdoreke zimani da pêk tê, heçî hînbûna zimani ye, ew li dezgeheke fêrkirina zimani da pêk tê. Kesê ku ziman jî derdorekê werdigire, mêjiyê wî pêşî rêzikên wî zimani tomar dike, piştî peyv, qalib û şayesên zimani tîne tomarînin. Lewma jî mirovek bi peyv û rêzikên sinordar dişê, hej-mareke bêsinor qalibên derbirîne (peyv, komepeyv, hevok û riste) hilberîne.

Kesên ku bi zimanekî mezin bûbe, dikare jî aliyê dengrêzî, peyvsazî û hevok-saziye ve tiştên aîdî zimanê xwe û yên ne aîdî zimanê xwe jî hev cuda bike. Her wiha dişê jî hev derxe ka kîjan hevok û riste li gorî rêzimana zimanê wî rast e, yan ne rast e, anku kîjan hevok û riste rêzimana ye yan ne rêzimana ye. Ji vî rewşê ra hestpêkirinê gotin. Axêverên resen ên zimanekî her çî qas bi awayekî teorîk rêzikên rêzimana zimanê xwe nezanin jî jî ber vê hestpêkirinê dizanin ka kîjan deng e zimanê wan e, kîjan peyv li gorî dengrêziya zimanê wan pêk hatiye, her wiha kîjan komepeyv, hevok û riste rast e, kîjan ne rast e.

Temasa bi zimanê din ra bandoreke neyînî li vê hestpêkirina surîştî dike, lê belê, serdestiya zimanekî li ser zimanekî din bi rêya bernamewên zimani yê desthilatdaran, vê hestpêkirina surîştî pêşî qels dike, pîrî caran jî ji holê radike. Tiştê ku îro hatiye serê me jî ev e, îro êrişeke tund li ser vê hestpêkirina me ya surîştî ya zimani heye. Bo nimûne zimanê kurdî ku zimanekî niv-er-gatîf e, di bin bandora tirkî da ber bi akûza-tîfîbûnê ve tê dehdan. Bala xwe bidin zarokên ku li bajarên di bin bandora tirkî da hinî zimanê kurdî dibin, rêzikên ergatîfîyê wernagirin, li şûna wê rêzika akûzattîfîyê ya tirkî transfer dikin anku li şûna ku bibêjin, ‘‘Min taştê xwar’’, dibêjin, ‘‘Ez taştê xwarim’’. Ev rewşeke balkêş e, divê mirov baş balê bidê. Ji ber ku axêverên nû yên kurdî di hawirdoreke bi tirkî dorpeçkirî da jî hejmareke kêma a axêverên zimanê kurdî werdigirin, nikarin hemû rêzikên kurdî bi awayekî rast wergirin, hingî radiabin wan rêzikan jî zimanê serdest vediguhezînin kurdî. Dîsa bi heman bandorê hestpêkirina zayenda bêjeyekê nûhatî her diçe bi mirovan ra qels dibe.

Hin caran jî nivîskarên me bi nezani rêzikên zimanê me xera dikin, bo nimûne, hinek nivîskarên me dest pê kirine, hevok-saziya kurdî xera dikin û hevokên li gorî rêzimana tirkî saz dikin. Her wekî, li şûna ku bibêjin, ‘‘min got, ‘ez îro nayê malê’’ dibêjin, ‘‘Ez îro nayê malê’’ got’.

Ev mînak jî nîşan dide ku hestpêkirina surîştî ya zimani me jî gelek aliyên ve tûşî êrişên pişafîtinê dibe.



## Xwepêşandanên li Iraqê berdewam in

- Di 1'ê sibatê de serokkomarê Iraqê Berhem Salih bi fermî Mihemed Tofiq Elawî ji bo pêkanîna hikûmeta Iraqê erkdar kir. Li gorî destûrê jî pêwîst e di nav 30 rojan de hikûmet bê avakirin. Tevî erkdarkirina Elawî ya ji bo pêkanîna hikûmetê jî, li Iraqê xwepêşandan nesekekin. Xwepêşanderên li Iraqê erkdarkirina Elawî red dikin û xwepêşandan jî dewam in. Xwepêşanderên li Bexdayê bang li hemû xwepêşanderên din ên li Iraqê kir da ku xwepêşandanên xwe dewam bikin. Li gorî rêjeya dawî ya Komîsyona Mafê Mirovan a li Iraqê, hejmara xwepêşanderên li Iraqê hatin kuştin, gihiştîye 556 kesan. **BEXDA**

## Barzanî û wezîrê Belçîkayê civiyan

- Serokwezîrê herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî û Wezîrê Derve û Bergiriyê yê Belçîkayê Philippe Goffin heftaya borî civînek li dar xist û pêwendiyên herêma Kurdistan û Belçîkayê gotûbêj kirin. Barzanî diyar kir ku zêdekirina çavkaniyên dahatê yek ji xalên girîng ên nexşeyên kabîneya 9'emîn a herêma Kurdistanê ye. Philippe Goffin anî ziman ku li dijî terorê de piştevanîya xwe bidomînin. Goffin her wiha got ku peywendiyên Belçîkayê yê bi hêz li gel herêma Kurdistanê hene û di çend salên derbasbûyî de bi pêş ketine. **HEWLÊR**


## Mezlûm Ebdî ENKS pîroz kir

- Fermandarê giştî yê Hêzên Sûriyaya Demokratîk (HSD) Mezlûm Ebdî der barê biryara Encûmena Niştîmanî ya Kurdên Sûriyeyê (ENKS) ya vekirina buroyên xwe li rojavayê Kurdistanê daxuyaniyek da. Ebdî bal kişand ser girîngiya vekirina buroyan û got: "Biryara birayên ENKS'ê ya vekirina buroyên xwe gaveke girîng e û di çarçoveya gavên avakirina baweriyên de ye." Ebdî vê pêngava ENKS'ê silav kir û diyar kir ku ew ê bi tevahî ked bidin da ku nêrinên wan nêzikî hev bibin. Ebdî bi vî awayî girîngiya avakirina yekitiya kurdî anî ziman û got ku divê li gorî vî her alî berpirsiyariyên xwe bi cih bîne. **KOBANÊ**

## Partiyên kurd yekîtî nîqaş kir

- Şandeya Partiya Kesk a Kurdistanê heftaya borî çû serdana Tevergera Azadî. Her du aliyên aloziyên herêmê, yekitiya kurdan û metirsiya li ser jîngeha herêma Kurdistanê nîqaş kirin. Piştî civînê serokê Partiya Kesk a Kurdistanê Loqman Ehmed axivî û da zanîn ku di civîna xwe de behsa yekbûna hêz û partiyên kurdan û parastina jîngeha Kurdistanê kirine. Ehmed diyar kir ku li ser van mijaran ew û Tevergera Azadî di heman fikrê de ne. Hevserokê Tevergera Azadî Mihemed Abdula jî anî ziman ku li hemberî hemû desthilatxwazên ku dibin sedema têkçûna jîngeha Kurdistanê, divê ji bo parastina jîngehê hema-hengiyek hebe. **SILÊMANÎ**

Aysel Tabak



Van rojên dawîn rojeva Tirkîye û Rûsyayê gelek germ e. Hikûmeta Sûriyeyê di meha kanûnê de operasyona "Berbanga Idlibê" da dest-pêkirin û bi awakî lez pêş ve diçe. Di 28'ê çileyê de, herema Idlibê Maraas El Numan bi dest xist. Rêya ku di Maraas El Numan de derbas dibe Şam û Halebê digihîne hev, loma herêmeke stratejîk û girîng e. Bi vî operasyonê Esad ji destpêka şerê navxweyî yê Sûriyeyê ku 9 sal in didome, heta niha operasyona herî berfireh bi rê ve dibe. Tirkîye bi tundî li dijî vî operasyonê derdikeve.

Tirkîye dizane ku jidestçûna Idlibê, dê li Sûriyeyê qada tevgerên wan teng bike û di pêşerojê da mecbûr bîmîne ku ji deverên din ên ku li Sûriyeyê dagir kirine jî derkeve. Piranî şirovekerên politîkayê dibêjin ku pişte Idlibê dê dor bê Efrîn û bajarên din ên ku di bin kontrola Tirkîyeyê de ne û tîrsa Tirkîyeyê ya herî mezin jî ev e.

Piştî ku operasyona Idlibê dest pê kir, Tirkîye nerazîbûna xwe eşkere kir û diyar kir ku hewce bike dê li dijî rejîma Sûriyeyê şer bikin. Piştê jî leşker û çekên giran şandin herema Serakîbê. Di 3'yê sibatê de artêşa Sûriyeyê êrişî leşkerên tirk kirin. Tirkîye jî ber vî êrişê Rûsyayê jî şûdar kir. Lê Rûsyayê got "hûn bêtî ku agahî bidin me çûne wê derê û bûne hedef." Yanî Rûsyayê dibêje "bê destûra me hûn nikarin li herêmê gav bavêjin, heke bavêjin bersiv jî ev e."

Hiwa Khoshnaw



**Tirkîye (bakurê Kurdistan):** Ji ber rola Tirkîyeyê ya di NATO'yê de, kurdên vî welatî her dem bûne qurbana leyîstokên civaka navdewletî. Di sedsala çûyî de, siyaseta navdewletî nexwest rewşa dijwar a kurdên Bakur bibîne û her car alîkarî da siyaseta faşîst a Tirkîyeyê.

Di salên dawiyê de çend faktor bûn asteng ku dewleta tirk nikare qirkirineke din a wekî ermenan li ser kurdan bike: Kurdên Bakur li gorî parçeyên din ên Kurdistanê bi dîsîplîn, xwedî hişmendiyek cuda ya politîk, îdeolojîk û rêxistkirî ne. Piştî hilweşîna sosyalîzma real, rola Tirkîyeyê her gav wekî berê girîng nîn e. Ji ber tîrsa welatên rojavayî ji Tirkên Genç û Osmanîyên nû yê ku xewnek nû (Misak-î Milli) û vegera Osmanîyan ji bo Rojhilata Navîn dibînin, rê nêdan ku kurd bi temamî bînin qirkirin.

Di sala 2016'an de Trump nêrîna xwe li ser tîkiliyên Tirkîye û kurdan anî ziman û got "Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê (DYA) dikare zextê bide her du aliyên ji bo ku ew danûstandinê bikin." Em dibînin ku jeostratejiya Tirkîyeyê ji bo DYA û Rûsyayê girîng e. DYA nikare Enqereyê bixwe nav destên hêzên din, lê divê Enqereyê wek berê kontrol bike. Li gorî tecrûbeyên berê, welatên xwedî hêz xwestin Tirkîyeyê kontrol bikin û li qurbaniyê geriyane. Loma mirov dipirse gelo qurbaniya/ê vî carê kî ye? Dibe ku

# Li Rojhilata Navîn tîkiliyên Tirkîye û Rûsyayê



Di demên dawî de her diçe tansiyona di navbera Tirkîye û Rûsyayê de bilind dibe. Lê Rûsyayê wek Tirkîyeyê bi dengekî bilind nayne ziman. Ew helwesta xwe bi kirinên xwe, di piratîkê de nîşan dide. Gotinên xwe jî bi zimanekî politîk, bê bertek û gefxwarin dibêje. Lê van rojên dawiyê bi aşkera tîne ziman ku Tirkîye sozên derheqê Idlibê de dabûn bi cih neanine û naxwazin Idlib paqîj bibin.

Piştî nakokiyên di navbera Rûsyayê û Tirkîyeyê de, Tirkîyeyê hin gavên ku Rûsyayê ji wan nerazî ye avêtin. Li aliyekî aşkera kir ku 200 milyon lîra ji artêşa Ukraynayê re dê bişînin, li aliyê din dîsa anîn ziman ku Tirkîye Kirimê wek axa Rûsyayê nabîne. Li ser van Rûsyayê jî di çapemeniya xwe de hin kirinên Tirkîyeyê yê nezagonî aşkera kirin. Ajansa FAN'ê ku nêzî rêveberiya Rûsyayê ye, dosyayên li ser tevgerên Tirkîyeyê yê nezagonî weşandin.

Li gorî agahiyên dosyayê Tirkîye çawa piştgirî daye avabûna rêxistina terorî ya "Eniya Nusrayê". Di nûçeya FAN'ê de îtirafên terorîstên ku dil ketine destê leşkerên Sûriyeyê hene. Di vî de terorîstên dîlketî behsa ka çawa îstixbarata Tirkîyeyê ew mecbûrî tevlibûna rêxistina Nusrayê kirine hene. Bi kuştina malbatan ew kes tehdît kirine. Piştî tevlibûnê li kampên Tirkîyeyê perwerdeya leşkerî dibînin û piştê re jî di bin sîwana rêxistinê cuda de li Sûriyeyê şer dikin.

Li gorî agahiyên ku FAN'ê bi dest xistine, bi alîkariya Katarê rêxistina leşkerî ya Tirkîyeyê SA-DAT'ê çeteyan ji Sûriyeyê derbasî Libyayê dikin. Di nûçeyê de tê îdiakirin ku ji 24'ê kanûnê heta niha bi qasî hezar û 200 çete anîne Tirkîyeyê. Li kampên derdora bajarê Îzmîrê bi qasî du hefte perwerdeya leşkerî dîtine û piştê bi balafir û keştiyan derbasî Libyayê kirine. Di nûçeyê da tê îdiakirin ku

2 hezar dolar mûçe didin van çeteyên peretî û soza mafê welatîbûna Tirkîyeyê didin. Li gorî agahiyên ajansê 50 endamên SA-DAT'ê ji bo perwerdeya mîlîtanê Hikûmeta Trablusê - Sarac li Tirablûsê wezîfedar in.

Helbet ev dosyayên ku ajans û rojnameyên Rûsyayê aşkera dikin gelek berfireh in. Xuya dibe ku ev agahiyên girîng îro bi dest nexistine. Lê gava ku nakokî di navbera her du dewletan de derdikevin yek bi yek dosya tenê eşkerakirin. Mebest çî ye? Dibêjin ku "em bi hemû kirin û tevgerên we dizanin, belge û agahiyên teqez di destê me de hene. Em bixwazin dikarin van li dijî we bi kar bînin."

Welhasil her du dewlet bi gunehên hevdu baş dizanin lê çavên xwe ji hevdu re digirin. Rûsyayê jî berberjewendiyên xwe yê jeopolîtîk û aborî çavê xwe digire. Aşkera ye ku her du dewlet û gel tu car nebûne dost hevdu.

# Geo-Polîtîkaya nû û bandora wê -3-

PKK be? Ji aliyekî ve, welatên rojavayî naxwazin kurd bi tevahî bînin qetilkirin, lê li aliyê din jî çavên xwe ji kiriyarên Tirkîyeyê yê li hemberî PKK'ê digirin û alîkarî didin. Êrişî hewayî ya rojane li bakurê Iraqê yê di bin kontrola Amerîkayê de, qetilkirina sê endamên PKK'ê ya li Parîsê, mirina Omer Guney a bi guman di zindana Fransayê de mînaka vî ne. Ji bo veşartina hevkarîya di navbera hêzên îsbixbaratî yê Ewropa û Tirkîyayê de, rastiya van hîpotezên jorîn nîşan dide.

**Sûriye (rojawayê Kurdistanê):** Hemû guhertinên siyasî û bûyerên ku li Rojava hatine destnîşankirin, nîşanê didin ku nakokiyên Rûsyayê û Amerîkayê de berdewam bikin. Wek destwerdana Tirkîyeyê ya li ser Sûriyeyê, li ser hin xalan bi hev re dixebitin. Bi kuştina Qasim Silêmanî û êrişên hewayî yê Îsrailê, hinek desthiladariya Îranê hat astengkirin. Niha jî bi êrişên hikûmeta Sûriyeyê yê li ser Idlibê, Tirkîye tê derxistin. Li ser vî bîngê de destûrê bê dayîn ku rojavayê Kurdistanê bîmîne. Lê bi afirandina nakokiyên di navbera PKK'ê û Rojava de, ew hewl didin ku bandora PKK'ê li ser Rojava kêmtir bikin.

**Rola PDK û PKK'ê**  
Wek ku me li jor behs kir, siyaseta navneteweyî piştrast kir ku di navbera kurd û netewewelatên Rojhilata Navîn de divê hevsgengiyek

hebe ku ew hem wan bi kar bînin û hem jî kontrol bikin. Di heman demê de, li gorî wan di navbera partî û hêzên kurd de pêwîst e hevsgengiyek nû hebe, ew jî PDK û PKK ne. Her du hêz temsîla du xetên cuda dikin. Ji 1996'an ve nakokiyên wan hene. Ger metirsiyek li ser herduyan hebe, ew ê bi axifîn û alîkariya hevdu bikin. Lê bi gelemperî ew di nav nakokiyên de dijî (di destpêka salên 1980'yan de di navbera PDK, YNK û partiyên din ên kurd de şerê navxweyî hebû. PKK'ê dixwest amadekariya tevgerê leşkerî bike û hewcedariya wê bi alîkariya aliyên din hebû. Her du alî nêzî 4 salan li herêma Lolanê bi hev re xebitîn. Piştî tekoşîna çekdarî ya li dijî dewleta tirk û danûstandinên PDK û YNK'ê, PDK'ê endamên PKK'ê ji herêmê derxistin). Hewldana heya ya PKK'ê ji bo komkirina partiyên kurd li ser maseyê, stratejiyek kevin a salên 1980'yan e. Piştî mirina Talabanî, tenê wateyek vî yekitiyê heye, ew jî lihevkarîya PKK û PDK'ê ye. Partiyên din jî di navbera PKK'ê û PDK'ê de mane.

Piştî êrişî dewleta tirk a di 9'ê cotmeha sala 2019'an a li hemberî Rojava, PDK'ê dît ku êrişên-Tirkîyeyê ne tenê li Rojava de bikevin nav başûr jî. Ji ber vî yekê PDK ji AKP'ê zivirî. Xwepêşandanên mezînan ên li hemberî Erdogan û Trump hatine kirin û piştê reaksiyona kesên li çar aliyê cîhanê ya li hemberî dagirkeriya Tirkîyeyê ya li dijî Serêkaniyê rawestand. Loma carek din bi ser-

dana Mesrûr Barzanî tîkiliyên berê hatin berdewamkirin. PKK û PDK di warên siyaseta, stratejî, çand û elxaq de li dijî hev in, lê PDK baş dizane heke ne ji PKK'ê be dê rola wê ji bo Tirkîyeyê bi dawî bibe.

Yekitiya kurdan ne tenê xwedî pîvan a herêmî, di heman demê de rehend û pîvanên navneteweyî jî hene. Divê kurd ji hesabê vî yekê bikin. Kongreya neteweyî bi felsefeya netewewelatê norm digire lê modelek bi vî rengî ji hêla Ocalan ve bi dawî bûye û ev mijar ji aliyê wî ve hatiye girtin. Gelek aliyên berê xwe dan sloganên pan-nasyonalîst ku welatên Ereban jî bi vî rengî bûn, lê civîna Yekitiya Ereban (YE) ji hêla gelê ereb ve bûye pêkenok û ew piştî her civînekê dibêjin 'Ereban biryar da ku nebin yek.'

**Pêşeroja PKK'ê**  
Hêza cîhanî ya li devera Sûriyeyê hewl dide ku nakokî û cudahiya di navbera Rojava û PKK'ê de çêbike. Bêguman ev daxwaza wan e. Li Rojava, bi alîkariya PDK'ê hewl tê dayîn ku rêxistinên mîna ENKS'ê bibin xwedan statuyek bi mentalîteya (Kurdîstana Iraqê) Başûra duyemîn, bê avakirin. Bi vegera Amerîkayê re, Tirkîye hewl dide û hêvî dike ku PKK'ê bi rêka Projeya Projeya Başûrê Rojhilata (GAP) li parêzgeha Mêrdîne bi sînor bike û bi vî awayî li wê herêma Botanê marjînal bike.



## KNK'ê encamnameya civîna xwe aşkera kir

● **BRUKSEL** - Konseya Rêveber a Kongreya Nete-weyî ya Kurdistanê (KNK), 1'ê sibata 2020'an li navenda xwe ya li Brukselê civîna xwe ya asayî pêk anî. Di civînê de rewşa siyasî ya li Kurdistanê, guherîna rol û pêgeha hevsengiyana di navbera hêzên herêmî û cihanî de berfireh hatin nixandin. Di dawîya civînê de jî encamnameyek hat aşkerakirin. Mijara Wargeha Mexmûrê jî di encamnameyê de cih girt.

## 200 malbatên li Idlibê berê xwe dan Rojava

● **KOBANÊ** - Zêdetirî 200 malbatên ji bajar û gundewarên Idlibê, ji êrîşan neçar man ku cih û warên xwe biterikînin. Welatîyên ku koç kirin berê xwe dan Rojava. Rêveberiya xweser deriyê xwe li wan vekir. Heta niha 3 qefle ji koçberan derbasî Minbicê bûne û berê xwe dan Rojava. Şênîyên herêmê, koçberên Idlibê pêşwazî kirin. Rêveberiya xweser ji bo koçberan tevî derfetên kêm jî dest bi avakirina konan kir.

## Gendelî li Îranê gihîştîye asta herî bilind

● **TEHRAN** - Li Îranê krîza aborî û siyasî her ku diçe kûrtir dibe. Bi krîza aborîyê re hejmara xizaniyê jî zêdetir dibe. Cigirê serokomarê Îranê İshak Cîhangîrî diyar kir ku gendelî û hejarî li Komara İslamî ya Îranê gihîştîye asta herî bilind. Cîhangîrî rexne li dezgehên kontrolkirinê kir ku divê li hemberî gendeliyê xebatek çalak bi rê ve bibin. Her wiha got ku divê medya rola xwe bilîze û gendelkaran eşkere bike û pêvajoya gendeliyê bişopîne.

## Xweşkanî



Felemez Ulug

## Planên şaş encamên rast dernaxin

Bi şerê herêma Idlibê re hevsengiya êdî tu wateya peymanên Astana û Soçî yên di navbera Tirkiye, Rûsya û Îranê de nemaye. Wisa diyare ku, bi têkçûna van peymanan, di rojên pêş de ew ê pêşveçûnê girîng pêk werin ku qedera herêmê yekser eleqedar dikin.

Bêguman ev pêşveçûn di haman demê de ew ê hebûna Tirkiyeyê ya di herêmê de jî diyar bike. Di rewşa ç hejî de Enqere di navbera politikayên komên terorîst û Rûsya de dide meşandin asê maye û ger di vî politikaya xwe ya şaş de îsrar bike ew ê ji bo xwe rewşê hîn xirabtir bike.

Bi alikariya Rûsyayê ya hewayî artêşa Sûriyeyê li Idlibê li dijî komên terorîst ên bi pişgiriya Tirkiyeyê ve li herêmê hatine bicihkirin serkeftinê baş bi dest dixê û di encama van êrîşan de gelek cih hatine rizgarkirin. Rêveberiya Tirkiyeyê jî ber van êrîşan jî Rûsyayê acize. Lewma rêveberiya Enqereyê jî bo li herêmê bikaribe destê Rûsyayê lewaz bike û van êrîşan bide sekînanandin ketiye nav lêgerînê.

Rûsya li herêmê jî bo bigihêje armançên xwe bi gelek hêzan re tifaq bi pêş xist. Di pêşxistina van tifaqan de Rûsya her tim li gorî berjewendiyên xwe tevgeriye. Lewma dema li herêmê destkeftiyên wê dikevin bin xetereyê yekser dikare hevaltiya xwe ya bi van hêzan re bi dawî bike. Li herêmê rewşa wê ya leşkerî û siyasî jî dest dide ku ew bikaribe gavên bi vî awayî bavêje.

Rêveberiya Kremlînê demek dirêj bi Tirkiyeyê re jî nêz ve eleqedar bû. Ev eleqedariya bi Tirkiyeyê re ne ji xwe bû û vala bû. Wisa diyar e ku Rûsya li gorî stratejiya xwe Tirkiye û komên gerêdayî wê bi awayekî aqilane bi kar anîne. Wisa diyar e ku di plana Rûsyayê ya li ser herêmê de hin guhertin çêbûne. Bi van êrîşan ve derdikeve holê ku di planên nû de cih ji tirkan û komên terorîst re nîn e. Haya rêveberiya Erdogan jî ji wê planê heye. Lewma jî bo xwe erzan neke û bikaribe bi tehdîdên cuda destê Rûsyayê lewaz bike ketiye nav lêgerînê.

Lê planên şaş tucarî bi xwe re encamên rast dernaxin holê. Erdogan jî bo destê Rûsyayê lewaz bike berê xwe da Ûkraynayê. Moskwa bi çûyîna Erdogan a Kîevê pir aciz bû. Mirov dikare bêje ne di rêveberiya Moskwayê tenê di nav aliyên muxalîf de jî ev serdana Erdogan bi zimanekî hişk tê rexnekirin. Bêguman jî serdanê zêdetir mijara wan aciz dibe jî peyama şantajê ye. Ez di wê baweriyê de me ku rêveberiya Kremlînê ew ê li hemberî wê peyama Erdogan bê helwest nemîne. Wê me got jî despêkê ve Rûsya di çarçoveya planekê de nêzî Tirkiyeyê bûye. Wisa diyar e ku Pûtîn di meşandina wê planê de gihîştîye astekekê. Tirkiye dibe ku wek endamekî NATO'yê hebûna xwe berdewam bike, lê ji ber hevkarîya wê ya bi komên terorîst ew ê tu carî jî hêla welatên rojavayî ve wek partnerekî stratejîk û bi ewle neyê dîtin.

NATO û welatên rojavayî jî ber wê hevkarîya Tirkiyeyê, di asta stratejîk de agahî û xebatên istixbarî dan sekinandin. Ev jî ji bo Tirkiyeyê wendahiyeke mezin e. Pûtîn jî bo Sûriyeyê gotibû: "Heke di listîka piyêsê de çêkek li ser diwar hebe, di dawîya piyêsê de ew ê yek ve çekê biteqîne." Wisa diyar e listîka ku Pûtîn minaka wê daye rewşa şerê Idlibê radixe ber çavan. Di dawiyê de dixwazim ji gotinên pêşiyên rûsan minakekê bi we re par ve bikim, "Ji ber hirçê çêlek xwariye tawanbar e, lê çêleka ketiye daristanê jî nemaftar e."

# Bêdengî pejrîrandina êrîşan e

Navenda Nûçeyan

Ambargoya li ser Wargeha Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr), 17'ê tîrmeha 2019'an dest pê kir û heta îro jî didome. Tevî ambargoyê hefteya borî DAIŞ'ê êrîşî wargehê kir. Lê hîna jî dewletên navneteweyî, nêzikatiya hikûmeta başûrê Kurdistanê û Iraqê neguheriye.

Mexmûr jî bo kurdên ji bakurê Kurdistanê ku ji ber zext û zor-dariyê koçber bûn, bû stargehek. Rêwitiya ber bi Mexmûrê ve di salên 1994'an de dest pê dike. Koçberan li Mexmûrê jî tunebûnê jiyaneke, bajarek ava kir. Mexmûr wargeheke penaberan e û nêzikî bajarê Mexmûrê di nav sînoren Herêma Federal a Kurdistanê de ye.

Penaberên Mexmûrê di serî de çûn wargehên wek Şeraniş, Bêsev, Bihêrê, Geliyê Qiyametê, Etruş û Nînovayê. Her rêwitiyeke koçberan bi xwe re zehmetiyên cuda afirandin. Di rêwitiyê de bi dehan zarok, pîr û kal jî ber şert û mercên zehmet ên jiyane, jiyana xwe ji dest dan. Herî dawiyê berê xwe dan cihêkî wisa ku kesek ne bawer bû li vir jiyaneke bê avakirin; cihêkî hişk, zuha û tu derfetên jiyane lê tune bûn. Xani hatin çêkirin, dar hatin çandin, dibistan, sazî û dezgeh hatin vekirin. Jiyanêke hevpar hat pêşxistin. Koçberên ku hejmara wan dighêje 15 hezaran, li dijî politikayên tunekirin û koçberiyê jiyaneke nû afirandin.

### Ambargoya li ser wargehê

Li Mexmûrê her çend pergaleke nû ya jiyane hat avakirin, di sa jî êrîşên li hemberî koçberan bi dawî nebûn. Wargeh 6'ê tebaxa 2014'an bi êrîşan çeteyên DAIŞ'ê re rûbirû ma û di roja duyem de wargeh hat valakirin. Lê bi berxwedana Hêzên Parastina Cewherî (HPC) yên wargehê carek din mexmûrî vegeriyan cihê xwe. 17'ê tîrmeha 2019'an li restoranteke Hewlerê rêveberêkî Rêxistina İstixbarata Milî (MÎT) ya tirk hat kuştin û piştê rêveberiya Partiya Demokratîk a Kurdistanê (PDK) wargeha Mexmûrê dorpêç kir û ambargo danî ser Mexmûrê.

Ambargo heta niha jî didome. Ji



## Em hatin cem xwişk û birayên xwe

ambargoyê nexweş nikarin biçin nexweşxaneyan, xwendekar nikarin biçin dibistanên xwe û penaber nikarin pêwîstiyên xwe rojane pêk bînin. Çend rayedarên Mexmûrê xwestin hevdîtin bi cihên eleqedar re pêk bînin lê heta îro jî tu bersiv nehatiye dayîn. Dayikên Aştiyê yên Mexmûrê jî ketin nav hewldanan û li ber asayîşa PDK'ê çalakiya rûniştinê li dar xist û rewşa Mexmûrê kir rojevê. Lê hîn jî li hemberî ambargoyê helwesteke hevpar a xurt ji hêla sazî û dezgehên fermî ve nehatiye nîşandan.

### DAIŞ'ê êrîş kir

Tevî ambargoyê çeteyên DAIŞ'ê jî êrîşî wargehê dikin. Herî dawî çeteyan 2'yê sibatê êrîşî wargehê kir û di encamê de 2 çeteyên DAIŞ'ê hatin kuştin. Her wiha 3 şivan jî birîndar bûn.

Li hemberî êrîş û ambargoyê dewletên navneteweyî, hikûmeta Iraqê û hikûmeta başûrê Kurdistanê bêdeng in. Helwesta partiyên siyasî yên başûrê Kurdistanê jî bû sedema nîqaş û rêxweyî. Gelo bêdengî tê çî wateyê? Gelo êrîş û ambargo nîşaneyên tenêhiştin û valakirina wargehê ye? Ji bo wargehê dê plansaziyeke çawa li pêş bê xistin û çima Mexmûr?

Şandeya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) ku ji nûner

Mexbûb Salih a li Mexmûrê diji bû şahidê hemû pêvajoyên li wargehê. Wargeha ku di pêvajoyeke hesas re derbas dibe bandorê li ser jiyana penaberan dike. Salih bal kişand ser êrîşan û wiha dest bi axaftina xwe kir: "Ev 26 sal in em penaber in. Ji ber zilma dewletê em koçber bûn. Em hatin cem xwişk û birayên xwe. Lê ew jî bi hevkarîya dewleta tirk her tim êrîşî me dikin. Ev 7 meh in ambargo li ser wargehê heye. Hikûmeta herêmî nahêle em pêwîstiyên xwe dabîn bikin. Niha jî çeteyên DAIŞ'ê êrîşî wargehê dikin. Hikûmeta herêmî çima bêdeng e. Asayîşa PDK'ê destûr neda ku em birîndarên xwe bibin nexweşxaneyê."

û endamên partiyên başûrê Kurdistanê pêk dihat hefteya borî çû serdana malbatên birîndaran. Di serdanê de hat diyarkirin ku bi yekitiyê dikarin êrîşan vala derxin û pêwîst e hikûmeta herêmî neyê listokan.

Şandeyek ji partî û saziyên bakurê Kurdistanê pêk dihat jî çû serdana wargehê. Di serdanê de şandeyê diyar kir ku ew jî bo rakirina dorpêça li ser Mexmûrê û yekitiya neteweyî ya kurd hewl didin.

### 'Bêdengî sîc e'

Endama Lijneya Mafên Mirovan a Parlamentoya Iraqê Yusra Recep bal kişand ser rewşa Mexmûrê û da zanîn ku divê di aliyê mafê mirovan û mafê penaberiyê de Iraq bi wê berpirsariya xwe ve girêdayî be û êdî bêdengî nayê qebûlkirin. Tevera Azadiya Jinên Êzîdî (TAJÊ), êrîşên li hemberî Mexmûrê şermezar kir û diyar kir ku wargeh li gorî qanûnên navneteweyî dikeve bin sîwana ewlehiyê.

Mixabin dewletên navneteweyî beramberî hemû êrîşên ku heta niha pêk hatine bêdeng dimînin û bêdengmayî jî sîc e.

Endamê Polîtburoya Hizba Zehmetkêşanî Kurdistan Bêkes Qadir jî der barê mijarê de destnîşan kir ku kesên li kampa Mexmûr penaberên siyasî ne û ji ber politikayên dewleta tirk hatine û wiha dom kir: "Em bang li hikûmeta herêmî û Iraqê dikin ku ambargoya li ser wargehê rakin."

## Ji bo çareseriyê banga diyalogê

16'emîn Konferansa Kurd a Navneteweyî bi sernavê "Yekitiya Ewropa, Tirkiye, Rojhilata Navîn û Kurd" di 5 û 6'ê sibatê de hat lidarxistin. Piştî nîqaşên berfireh, encamnameya konferansê hat aşkerakirin.

Di encamnameyê de hat bibîrxistin ku li gel tifaqên herêmî û perspektîfên gerdûnî yên kurdan li herêmeke ku şer û krîz lê rû dane, pêşketinên nû bi xwe re anîne. Di encamnameya ku hat

aşkerakirin de wiha hat gotin: "Divê êrîşên Tirkiyeyê yên li dijî Rojava wek bînpêkirina hiqûqa navneteweyî bê dîtin û banga lezginê bikin ku yekîneyên tirk vekişin. Divê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, ji bo siberoja Sûriyeyê tevî komîsyona reşnivîs destûra bingeînê bikin. Divê bi biryardarî bang li Tirkiyeyê bê kirin ku êrîşên xwe yên esmanî yên li herêmên Kurdistana

Iraqê bi dawî bike. Divê endamên HDP'î û hilbijêrên bîrdar, rêz ji encamên hilbijartinê re bê girtin. Divê tecrîdê bê bidawîkirin û li gorî hiqûqa navneteweyî tedbîrên diplomasiyê, siyasî û hiqûqê bikin. Ji bo çareseriyê pirsgirêka kurd divê dest bi diyalogê bikin. PKK'ê ne rêxistîneke terorê ye. Dadgeha Bilind a Belçikayê hemû sînodariyên li ser ferdên kurd û partiyên divê bîrdar kirin." **BRUKSEL**



## Li keviya rûbirûbûnê...

Dîlan Aydin

Van rojan ji gelek tiştan dixwazim bir-evim. Ji dimênên bajarên talankirî, zarokên li kampan li ber baranê, bêcil û bêpêlav, hestiyên pakrewanên di gorên bêkesan de bêxwedî mayî! Van roj û mehan şahî û xemgînî tevlihev dibin. Jiyân û mirin, şev û roj bi hev re ne... Van rojan ji xwe direvim, ji dengê xwe, ji gotinên dubare, ji bendewariyên tewş û vala! Van rojan li keviya pirsên delodîn im... Pirsên ku ji bo bersivên xwe bigirin, bi şev û roj di cenga giran de ne!

Li vî bajarî, li hevokên kurdî yên ku her yek ji wan tenê dikare xwe bi hezkirin û agirê kurdîtiyê biafirîne digirim. Li hevokên ku bikarin rastiya 'kurd-bûnê' vebêjin, me li kurdî û Kurdistanê vegevin! Kurdîti çî agirekî bêdewî ye... Kurdîti çî rêyêke dût û dirêj e di vê serdema bêwijdan û bêsinde de... Kurdîti çî sebr û ruheki ji pola ye... Çî zanîneke dût, bireke kût, janneke giran e!

Li keviyê sekinîme niha. Li kîjan aliyê dinêrim; barê salan civiyane, temenê borî tîra kirin û vegotinê nekiriye. Dimen bi dimen derbas dibe her tişt, vediguhere dimenek li cihê xwe asemayî! Ne civatek cidî heye tu lê vebêji, ne peyam cihê xwe digrin û ne ji kar û emel ji dil û birêkûpêk xuya dikin! Wekî jirêderketinekê ye her tişt... Bêbextî û newêreki bi çend gotinan rûyê xwe spî dikin! Kambaxî ne gelek tişt, tenê bi gotinan xwe dubare dikin! Di nava mij û moranê de dibêjin qey dime-nên li pêş çavan zelal in... Di nava valahî û sistahiya demê û sedbarehiyê de wekî ku ser û dil ronî û rehet bin!

Vaye li ber çavan e! Gotinên xwe dubarekirî xwedî tu wateyê nîn in êdî! Ji bêçaretîyê tîr ser ziman. Xwe ji xwediyên xwe ji ji xweza û raza jiyânê bêpar dihêlin! Vaye em dibînin! Rewşên rehet û zelal şêlû dibin, ên şêlû, bi çend gotinan wekî kefa li ser avê xwe spî nişan didin.

Ji demê bêhna valahî û dubaretîyê tî. Aqil û hest nikarin bi demê re wekî îbadet, xwe pak û nû bikin. Nikarin bi-bêjin îro ne duh e, berdevamiya ye ye lê rojê nû ye, zindî û tenê ye... Dido-min pirsên bêbersiv, tenêti zêdetir dibe ji ber wan... Tenêbûna demê û ya însan çî xweş û jandar e! Çî xweş e ku tu bi xwe re, bi rastî û şaşiyên xwe re rûbirû dimîni... Çî zor û watedar e rêwîtiya bi xwe re û bi demê re.

Ji vê serdemê bêhna mirina pêşwext tî! Dê û bavên kurd, bi mirina zarokên xwe, zarok bi mirina dê û bavên xwe, ji xwezayibûna jiyân û mirinê bêpar dimînin! Ji vê serdemê bêhna jîbirkirin, durbûna ji hev û têgehên ku wateya xwe winda kirine tî! Em ê bi kîjan gotin û hevokan, helbest, cerebe û nivîsan bikaribin xwe vebêjin. Em ê bi kîjan serî û wijdanî dest, dil û keda xwe bikin yek!

Gotin, yek bi yek xwe li asoyên xuyayî û nexuyayî didin. Dixwazin li ser zimanê me, bibin hevokên cuda, azad û zanînê... Dixwazin her yek ji me bi aqilê xwe bifikire, bi xwezayibûna xwe bimîne, perdeyên demê ji pêş çavên xwe hilîne... Hevokên li ser zimanê me, dixwazin bi dilê azad, pîr û pak bigihîjin merheleya 'xwebûnê' û ji xwe re bibêjin; "êdî wiha nabe! Bi halê heyî, ne em dikarin xwe bibînin ne ji hev!" Xwe bavêjin bextê xwe û hev! Ji jîbirkirina ku îxanetê bi xwe re tîne dût bisekinin.

Li stêrkên ronî û mayînde binêrin em, ew her dem wekî 'xwe' ne, li cihê xwe, ronahiya çav û geşbûna hêviyên me ne... Ji stêrkan re bibêjin em; tevî ku şehîd navê xwe ji wan digrin, di dilê me de li ba wan in ji em nikarin cihêki ji wan re li welatê xwe çêkin! Bibêjin; bi hezaran şehîdên me li cih û warên xwe 'bêwar' in, gor bi gor bajar bi bajar digerin! Ji şehîdan re bibêjin; ji ber halê xwe yê heyî, em ji wan pîr û pîr şerm dikin!

# Ji Bakurî û Nesrîne heya simbolên îro!

Kakşar Oremar



Di bernameya Navdarên Kurd<sup>(1)</sup> de mamosta Bakurî (ku bi eslê xwe Asûriyê ji bajarê Koyê ye û xizmeteke mezin ji wêje û strana kurdî re kiriye), dema dengê hunermend Nesrîn Şêrwan guhdar dike, nikare hêsiyên çavên xwe bigire. Ji dil, ji bo wan sal û biranînên tije xweşî, bi **Hesen Cizîrî, Mihemed Arifê Cizîrî, Meryem Xan û Nesrîn Şêrwan** re hêsiyan dibarîne ku di hejarî, nedarî û bêmîkaniyên herî zêde de him xwedîti li hunereke kurdî ya resen dikirin û him jî tevîhev bi hurmet û qedîmasiyeke bêdewî dost û heval bûn. Ew li pey nav û nasandina xwe nebûn lê ji ber mûtewazî-bûnê qîmeta xwe jî li ba herkesî didîtin. Dîwana wan bi hunera wan re mîr û axa jî neçar dikirin ku rêzê li wan bigirin.

Mamosta Bakur di temenê 80 salî de mafdar e ku bi dengê Nesrîn Şêrwan re rondikên çavan bi-barîne. Nesrîn Şêrwan jineke rûxweş, dev bi kenbû. Nêrinên wê tije gotin û daxwazên bêdewî, hesretên salên bihûrî bûn. Rûyê ku êşên bêderman jê dibarin, lê dema ji hevkarên xwe re mêvandariyê dike deng û kena wê a siruştî bala herkesî ber bi wê ve dibe. Qedîmas û dilovan, hûrmetkar û rûrast, xweş sohbet û evîndara rêzgirtinê bû, xwe ji kesî bilindtir nedidî û karekî wiha ji wan kesan re hiştibû ku qîmeta hunera resen dizanîn.

Nesrîn yek ji wan jinên hunermend bû ku weke momikêkê li ser geşkirina rêya hunera kurdî heliya û bêrawestan dengê xwe tevî xweşî û nexweşiyên jiyana gel û civakê kir. Serbihûriya wê ji karê şivantiyê heya stranbêjiyê bi çend pêvajoyan re derbas bû.

Yek ji wan jinên ku ji bo xizmeta hunera kurdî hevçax bi **Meryem Xan û Dayîkî Cemal** re di rêza yekê li hemberî çewtiyên sistema feodalîzmê sekinî û li ber xwe da, Nesrîn Şêrwan e. Navê wê yê rastî Nusrat e an jî li gor hinek jêderan Xoxê Omer Osman e û di sala 1928'an li Şirnexê hatiye dinê. Ew ji malbatekê ye ku berê rewşa jiyana wan pir baş bûye, lê piştî destpêkirina serhildanên li bakurê Kurdistanê û guherînên siyasî, civakî û aborî li herêmê rewşa jiyana malbata wan jî telîhev bibû. Ji bona wê jî bavê wê Omer Osman neçar ma ku li sala 1932'an weke hezaran malbatên din berê xwe bide başûrê Kurdistanê. Cara pêşîn li gundê Darhozanê û piştê jî di sala 1933'an de Omerê bavê Nesrînê hemû zarokên xwe şandin bajarê Zaxoyê. Li wir Nesrîn bi bira û xwişkên xwe re di nava malên dewlemendan de dixebitîn.

Li pey ewqas zehmetiyên jiyânê ew her dem qedirê himpîşeyên xwe dizanin, bi hev re semîmî û ji bo armançên baş li kêleka hevîn. Di wêneyên ku li pey wan mane de, em van rastiyan bi zelalî dibînin. Ew



wiha bûne simbolên nemir û nişên îro ji jî deng û hunera wan hez dikin.

### Simbol û navdarên îro!

Lê ka em werin ser stranbêj û simbolên xwe yên îro ku di serdema teknolojiya modern û peywendiyên berfireh de çiqas bi pîrensîbên civakî ve girêdayî ne an jî ji hev hez dikin!

Carê ji hev hezkirina wan pirani rûmetî ye û jî dil nîne. Yên ku klîbên wan di Youtube de çend hezar kesan kilîk kirine, êdî navê 'hunermend' li ser xwe danîne û ji erd-esmanan jî qehirîne. Belkî mirov bikaribe hinekan weke simbol bibîne ku di bilindkirina dengê doza kurd a azadîxwaziyê de xwedî ked in, lê ya girîng hêza wan a ji hev û ji bo armançên pîroz hevgirtî nîne. Li gel hev namêşin, ji ber wê jî zû dikevin û tîne ji bîrkirin, di çavê civakê de jî giranî ji wan re namîne. Hinek ji wan koletiyê dikin û "hunera sifarişî an jî pêşniyarkirî" ji bo du dolaran dikine karê xwe yên salên dirêj ên jiyânê. Êdî "hunera rojê" li ba wan bi çepik û her bijî gotinekê hunermendî tê hesabandin. Carna ku tîne ba hev û behsa berjewendiyên neteweyî ên gelê kurd dikin, dîsa jî ji ber berjewendiyên xwe yên şexsî zû ji hev dûr dikevin. Ji ber belavkirina wêneyekê wan yê komî nivîskar û roj-namevanên xwe mehkeme dikin û bi pirsyarên: "**Ka te çima ez û filankes anîne sewiyekê? Ez li ku derê û ew li ku? Ew kîye û çî kirîye? Hûn çima dixwazin bi daxwaza partiyên siyasî min kêmbikin? Ma ez deng û rengê huner û şoreşa Kurdistanê nînim?**" û çirdirêjiyên din wisa zû heta li ser kurtenivîseke du dêrî qezawetê dikin ku mirov li ser asta wan ya rewşenbîrî-hunerî dikeve nava gumanan. Mixabin hinek kes hêsta jî nizanin ka di civakê de cihê wan li kûderê ye. Tevî ku sedan belge simbolbûna wan a dîrokî diselmînin lê dîsa jî bi hereketeke erzan û bêrêzane


sadebûna xwe didin diyarkirin. Mezinbûna xwe heta di çavê hevalên herî nêzi xwe de jî biçûk dikin. Hêsta jî nizanin ku destpêka pêvajoyan an jî proseseke civakî-siyasî a nava sinorên welatê xwe bûne. Bendewarî ji wan bi qasî yên hemû partiyên siyasî li Kurdistanê hene, lê di çavê wan partiyên de jî xwe sivik dikin. Belkî qet muhtacî beyankirina hinek gotinên vala û bêwate nebin lê bêdûrbînî hemû hisaba û kitaba tevlihev dikin û di çavê xelkê de sivkatîyê dikine para xwe. Ez di karê kesên wiha de xetêke jiyânê ya ku "**xwedî stratejî**" be nabînim. Ew pir rihet dikarin her carê bi awayekî kirasê li ber xwe biguherînin û bibîne lîstika destê siyasetmedar û heta dewletên dagirkerên Kurdistanê jî. Sedemeke bindestiya me jî ji vê rewşa exlaqê koletiyê stranbêj û rewşenbîrî me tî. Razîbûna ji jiyana xwe ya rojane heta li hemberî zilma dijminên qedere dihêle ku hemû çînen civakê li hemberî azadîxwazan jî bibîne asteng. Di çepera ol û şêxên xulamok de jî hemû azadîxwaz û huneremendên şoreşger weke kesên hatine xapandin, tîne ditin.

Ez jî sedî sed maf didime mamosta Bakurî ku him ji kurdekî bêtir xizmeta wêjeya kurdî bike û him jî bi minetdariyêkê bêdewî behsa ked û xizmeta himpîşeyên xwe bike. Ew bi bîra me tîne ku dema Hesen Cizîrî, Tahir Tofiq, Nesrîn Şêrwan, Elî Merdan, Resûl Gerdî, Mihemed Arif Cizîrî, Gulbihar, Tehsîn Teha, Şimal Sayib û Mihemed Ceza li cem hev bûn, tevîhev dilpak û semîmî bûn. Derfetên herî kêmbi awayê herî baş bikar dianîn ku pêmgaveke meztir hilînin. Stranbêjên ciwan û nûpêgehîştî: Erde-

wan û Eyaz Zaxoyî an jî Hesen Şerif ji xwe biçûktir nedidîtin. Dengê wan guhdar û memnon bûn ku ewê rêbaza wan berdevam bikin, lê yên îro wiha nînin. Kes xwe ji kesekî din biçûktir nabîne û dema diaxivin jî ew rûrastî heta di tona dengê wan de jî nayê his kirin.

Li hemberî spasbêjî û qedirnasîyê herkes razîbûna xwe dide diyarkirin. Dema kesek li hemberî simbolên xwe heta peyvên: "ez xulam, ezbenî, mamosta û hwd" bikar tîne, hingî êdî kesên ku weke simbol tîne ditin divê vê yekê weke biçûkbûna muxatebê xwe nebînin. Belkî berevajî wê pêwîste ew jî bi hemû hestên xwe yên insanî jêre bibîne bersiv. Van rojan ez rastî hinek kesên wiha hatim û birastî dema min hest bi helwesteke wiha dût ji çanda Kurdî ya hurmetkariyê kir ji min re "**nexwestîrîn rojên jiyânê**" bûn. Hemû hestên min hê jî birîndar in. Mixabin ku em pîrî caran zû li ser gotin, nivîs û nêrinên hevalên herî nêzi xwe biyar û qirara didin. Carna zû qezawetkirin dibe sedema ji hev dûrketineke heta-hetayî a çend kesan, lê hêvîdar im ku ev nivîs bi hemû gotinên xwe yên tehl û xweş-nexweş derseke mezin bide wan kesan ku carna bi peyama kesekî fesad û bêexlaq hemû sinorên dostanî û hevaltiya salên dût û dirêj jî derbas dikin.

(1).<https://www.youtube.com/watch?v=sd1VbNKLCzg>





# Vernî de merdimî xerepnayî...



Kapîtalîst, emperyalîst û dagirkerî bê ke goşdarîya vengê xetereyan û nalîna xoza bikerê zirnaya xo danê piro. Camêrdê ke Otêla Madimakî ya Sêwasî de bi benzîna însanî veşêna, ame efûkerdiş. Ganî kurdî verê ke bikoyê erey, yewîtîya xo awan bikerê

ke nîjadê înan, zîwanê înan û kulturê înan desthilatê dagirkeran ra çîya yo hepîsxanan de yenê pêgîrotîşî. Desthilatê dagirkerî erdnîgarîya ma ra bigîrê heta însananê ma rê bi heme awayî neyartîya xo domnenê, qirkerdişanê xo domnenê, bi neyartîya xo ya şarê Kurdî rê sînoran derbas kenê û hemverê nê kerdişanê înan ma heta nê çaxî zî yewîtîya neteweyî ra bêpar mendê!

## Nesrîn Navdar

Wîna eyseno ma çaxêke zehf xerab derbas kenê. Her ke şîno teraza dînya ver bi xerabî şîna. La merdim eşkeno vajo ke vernîya teraza dînya teraza merdimahî xerepya. Vernî de exlaq û wijdanê merdiman xerepya înan zî dima ra ekolojî û heme dînya xerepna. Sebebê nê awayî yê tewr pîlî zî kapîtalîst, emperyalîst û dagirkerê.

Hetêke de hêzê dagirker û mêtîngerî bi dek û dolaban yan zî bi zordestîya xo rayîr û dagirkerîya xo kenê a û hewl danê teberê zîwanê xo, kulturê xo, dîne xo heta teberê nîjadê xo de tu yewî û tu çîke sax nêverde, bi neyartî nîzde şaran û erdnîgarîya şaranê ke bi zordarî ey bindest kerdê benê, ne wazenê erdnîgarîya înan pay ra verdê ne zî wazenê tarîxa înan saxlem verdê. Destêke înan de darî û torzîna daristanan kenê kor, destê înan ê bîni de girran tarîxe ma xera kenê yan zî kenê binê awe.

Çimê înan her tim talankerdiş, xerakerdiş û binawkerdiş erdnîgarîya Kurdan de yo û bi peymananê miyanberê xo û netewe-dewletanê sey xo dagirkerîya xo mayînde û saxlemtir kenê. Heto bîn ra zî kapîtalîst û emperyalîstan didanê xo kerdê qirike erd û ezmanî û hewl danê heme çimeyanê erd û ezmanî rayîrê menfaetanê xo de biqedênê û xera bikerê.

Kapîtalîst, emperyalîst û dagirkerî bê ke goşdarîya vengê xetereyan û nalîna xoza bikerê zirnaya xo danê piro û merdimahî zî roj bi roj bena şahid an zî mexdûrê felaketêke rîerdî. Xerabiyayîşê pergale ekolojî ke tedir bedelyayîşê awhewa û germîyayîşê kûrewî yeno beno sebeb ke felaketê pîlî, erderzî û nêweşî û vîrûsê mergî virazyê. Bi veradayîşê gazê sera, metanî û karbonî ke zêde ra xebetnayîşê petrol û komiran ra beno vila ne tenê pergale ekolojî û dengeyê dînya, yê heme gerdûne keno xera.

### 3 ra 1ê herra rîerdî xerepyaya

Goreyê daneyanê Rêxistina Zad û Zîretî yê Neteweyê Yewbîyayeyan 3 ra 1ê herra rîerdî xerepyaya. Helbet semedo ke kapîtalîstî, senayîkar û zîretkarê menfaetperestî û emperyalîst û dagirkerê gunewerî yew û nîme xo ra nîne war erd û hêgayan jehrî de verdene û serre bi serre no xerepnayîş zêdyeno û mexdûrê xerepyayîşê ekolojî zêdyenê. Bi eynî awayî serre bi serre mexdûrê şerranê emper-



yalîst û dagirkeran zî zêdyenê. Dagirkerê ke bi neyratîyêka sînoranenase erdnîgarîya şaranê bînan talan kenê, bi eynî awayî hêrişkarîya zîwan, kultur, bawerî û cuwîyîne şaranê bînan zî kenê. Yanê bi qaso ke neyarê xoza yê endeyke zî neyarê şarê bînan ê, neyarê zîwanan, bawerîyan û çandanê bînan ê.

### Kapîtalîstî zî mêrdan ra pêk yenê

Eke bala merdimî banco nê heme dagirker, emperyalîst û kapîtalîstî zî mêrdan ra pêk yenê. Nê mêrdeyê ke zerar danê ekolojî ro bi eynî awayî verê xo dayo cinîyan zî. Kapîtalîstanê ke cinî bazarê xo de sey meta xebetnayî, emperyalîstanê ke cinî bêerk verdayî û dagirkeranê ke cinî bê war, bê zîwan û bê gan verdayî eynî hişmendî ra yenê; zîhiyetê pederşahî û mêrdey serdest î, heta estanê înan de kar kerdo. Tirkîye de zî her tim serdestî ro cinîyan amîya kerdiş. La bi taybetî bi desthilatîya AKPî dir cinî zehf zêde û bi heme awayî ra ameyî îstîsmarkerdişî. Mêrdeyanê ke bêcezamendiş û efûkerdişanê hetê daraza ke girêdayê desthilatî ya ra eftarayîş giroto roj bi roj teda û tundîya xo cinî ser de zêdna û nê eftarayîşê înan ey heta qirkerdişîya cinîyan berd.

### Tena aşma çileyî de 27 cinî ameyî kîştîş

Roja ke cinî nêrê kîştîş yan birîndarkerdiş cinî ya. Tena aşma çileyî de 27 cinî ameyî

kîştîş û mergê hewt heban zî bişîk o. Sey her gamî rayedarê desthilatî ancî razî û bêvengê. Qic tera çêke sey Dêrsimî de ke ko û gêlî, kuçe û kolanê aye bi qamerayan xemelnayê wendekarêke bi nameyê Gulîstan Doku raste ra bena vinî û dewlete bi heme rayedarê xo ya veng nêana xo.

### Otêla Madimakî ya Sêwasî

Ancî serekkomarê na dewlete eşkeno bi wijdanêke rehet pênuşe bigîro xo dest û Mêrikêke ke Otêla Madimakî ya Sêwasî de bi benzîna însanî veşênayê, bîyo sebebê qetilkêrdîşê tûtêke 12 serrî ra bigî heta extîyarêke 67 serrî efû bikero. La nêwazeno cinîyêka nêweş e, wayîrê di hebî ewladanê astengdaran ke tu sûcêke aye çîne yo serbest bido verradayîşî. Rastîyêka desthilatê dagirkeran ê pederşahan; serbestveredayîşê sûcdaran û hepîskerdişê bêşûcan o.

### 33 însanan qetil kerd; ame efûkerdiş

Ahmet Tûran Kiliço ke di qetilkêrdîşê 33 însanan de ca giroto ame efûkerdişî û bi efûkerdişê ey agirê Madimakî ame gurkerdişî û paştî deya faşîstanê ke dimayê seydvaniya merdimahî yê. Elif Kisaya 70 serrî ke wayîrê di hebî ewladanê astengdaran a tenê semedo ke partîyêka siyasî ya legal e de qeydkerdî ya amîya hepîskerdişî. Bi eynî awayî bi desan nêweş û extîyarê cinî û mêrdeyî tenê semedo

### Sebebo yewin bêtefaqîya ma ya

Her çîqas nê aşmê peyînan de yewîtîya neteweyî ser tay gamî ameyê eştîşî zî hema raste de rewşêka ke zerra şarê Kurdî bifino ca nêaysena. Heta şarê ma yewîtîya xo ya neteweyî nêvirazo go emperyalîst û dagirkerî welatê ma gorey zerra xo ra jobînan rê pêşkêş bikerê. Eke eyro Bakur de zîwanê ma yeno qedexekêrdîşî, îradeyê ma yeno xespkerdişî, erdnîgarîya ma yena wêrankerdişî sebebê ey o yewin bêtefaqîya ma ya. Eke Rojawan de Efrîn, Serêkanîyê û Girê Spî kono destê dagirkeran, eke dewletê emperyalîst î bi eşkera paştî danê nê dagirkeran, sebebê ey bêtefaqîya ma ya.

### Yewîtîya xo awan bikerê...

Tarîxê çarparçekerdişê welatê ma Kurdan ra heta roja eyroyî herçar dagirkerê ke welatê ma dagir kerdî û emperyalîst î û her tim hemverê Kurdan de biyê yew.


La Kurdan çîray nêvato hela ma zî rayêke hemverê nê dagirker û emperyalîstan bibê yew î! Hewce nêkeno ke Kurdî heme yew îdeolojî yan zî yew bawerî pê bigîrê. Kam partî yan zî kam sazî û dezgeyî wayîrê çî îdeolojî yan zî çî bawerî benê wa bibê mecûrê ke ewro roj bê ke bikoyê erey yewîtîya xo awan bikerê.

### Yewîtîya ma serkewtîşê ma ya

A ya ke herçar parçeyan biersno pê û azadîya ma temîn bikero go yewîtîya ma bo. Yewîtîya ma serkewtîşê ma ya hemverê dagirkeran a, yewîtîya ma azadîya welatê ma ya. Wexta ma bi awankerdişê yewîtîya xo ri-sayî azadîya xo ma eşkenê bi têkoşîna xo heme şaranê Rojhelato Mîyanênî rê zî bibê mîsal. Yewîtîya şarê Kurdî yewîtîya heme Rojhelato Mîyanênî, yewîtîya Rojhelato Mîyanênî zî yewîtîya heme şaranê dînya wa hemverê kapîtalîst, emperyalîst û dagirkeran. Hemverê dagirkeranê ke welatanê şarî talan û dagir kenê û hemverê kapîtalîst emperyalîstanê ke xoza û ekolojî birîndar û xera kenê zî têkoşînêka hempar e lazîm a.

Heta heme Kurdî dagirkeran ra nêvajê nê, heta heme şarê Rojhelato Mîyanênî desthilatan ra nêvajê nê û heta heme şarê dînya emperyalîst û kapîtalîstan ra nêvajê nê go şerrî, tofanî û felaketî wîna bidomyê.





Ronahiya Rojê

Berfîn Dijle

Hisê ji xwe nebin

Xew, çi tiştêkî şîrîn e! Bi ya zanyaran, xweza xewar e. Ji şepayên berfê bigre, heta çiya û xetên faya erdnîgarî tev di xewê de ne. Gur û mar jî di nav wan de. Helbet, insan jî perçeyek ji xwezayê ne û ew jî radizên. Rojê bi xewa heft heşt saetî qîma xwe tînin. Ji bilî mêrê cîrana me ya kevin.

Cîranê me, biroj jî karû barê dinyayê têra xwe diwestiya. Lê te digot qey, li rûyê erdê jî wî pê ve ne kes dixebite ne jî ji mala xwe re mesrefekê dike! Gava li derî dixist, divê jin û hemû zarokên malê bihatana pêşiya wî.

Di rojên betlanê de, heta nivro radiket. Ne tenê jin û zarokên wî, zarokên der û cîranan jî êdî bi kurmê wî dizanibûn û ew jî diketin etîrya xewa wî! Ji tîrsa, ne li ber deriyên wan ne jî li ber şibakên wan ên ku li kuçê dinhirtin dileyîstin!

Dema xewek bi dilê xwe jî bikira, piştî taştê zarok li dora xwe dicivand in û ji wan dipirsî, digot; Ka em îro çi bikin? Heke, peryê wî biqediya û bi hemdê xwe hişyar nebûya, wekî hûtekî; çavên wî diçûn nava serê wî, kef bi devê wî diket û ti tişt jî ber dest û piyên wî xelas nedibû! Te digot qey mala hilweşandî ye!

Kurmê xwezayê jî dişibe kurmê cîranê me! Di van rojên îsalîn de, qey hingî Trûmp û dostikên xwe dikin terpînî, nahêlin xweza bi têra dilê xwe rakeve!

Niha; moçên hemû virus û xetên fayanan û berf û pilotên balafîran rabûne! Hema xewa kijanî biherime, radibe ser xwe û keysa wî li ku were moçên xwe li wir dixê!

De îca ser û berê xwezayê tune ye! Hema hiş bin û di xewa xwe ya Rostemî de hisê ji xwe nebin! Ne fay yeke ne pilot. Ne jî berf û virus.

Heke ê mayîn jî serê xwe ji xew rakin, êdî cih nema em pê de herin. Ji kerema xwe re, hay ji zom û konên xwe hebin. We, avê anî ji heft birî, ji heriyê şuşt. Ji bo zuhakirîne jî navêjin ser kêla dirî!

Delîlê xwe bînin!

Li Amûdê di dema dawî de her ku mirovek diçe ba asayîşê giliyê hinekan dike dibêjin ma delîlê te heye ku tu wiha dibêji. Ma em ji ku zanin ku tu bêbextiyar li wî an jî wê kesê nakî. Li ser bextê amûdiyan be dibêjin; Rojêkê Ferhano dibîne ku keriyekî mîh û bizin di nava genimê wî de ye. Ferhano hema di cih de diçe bi serê mîhekê digire û wê li wesayîta xwe siwar dike û berê xwe dide navenda asayîşê.

Ferhano tevî mîha di destê xwe de derbasî avahiya asayîşê dibe û ji wan re dibêje; şivanan zadê me berdan, tiş-

tek tê de nehiştin û beriya ku kesek jê bipirse got: ha vaye min delîl jî bi xwe re aniye vir. Asayîşê jî rabû jê re got: Tamam heyran me ji te bawer kir lê zû vê mîhê bibe nava kerî, beriya ku şivan were vir û bêje hinekan mîheke me diziyê.

Wê gavê li şûna tu doza mafê xwe li wan bikî wê ew giliyê te bikin û bêjin mîha me diziyê.

welhasilî ez serê we neêşnim tevî mîhê û asayîşê diçin gund û şivan hişyar dikin ku careke din hay ji pezê xwe hebe wan bernede nava zevî û genimê xelkê.



Carekê Kerîmo yê şanoger tiştêkî xweş ji bo welatparêzên medyaya civakî gotibû. Wê gotina wî gelekî dilê min rihet kir û dixwazim bi we re parve bikim. Ez serê we neêşnim, hin kes hene ku ji sibê heta êvarê li ser malperên civakî rexneyan li welatparêzin ku li welat mane dikin. Lê ew jî xwe napirsin gelo ew çima li derveyî welatî û çima li derveyî kar û xebata ne.

Êdî Kerîmo jî bi hevokê rewşa wan kesan nixandiye û wiha gotiye: Hez kirina hin kesan a welat wekî hez kirina zarokan a ji mirîşkên mala pîr û kalê wan e.

Dema diçin serdana mala kalê xwe ji sibê heta êvarê li pey mirîşkên wan dikevin û bi wan dilfizin, ji wan hez dikin lê êvarê jî ew mirîşk ji wan re tînin serjêkirin û goştê wan dixun.

Îca heyran, wek dibêjin kes bi halê kesekî nizane. Hûn jî ber zilm û zordestîya li welat an jî ji bo ku jiyana xwe û zarokên xwe xweş bikin çûne Ewropayê û li wir bicih û war bûne. Êdî hûn li welatekî ne ku ji bo bi lêvkirina fikir û ramanên xwe hûn natirsin. Hûn fikaran nakin ku ji ber gotinên xwe bi salan di girtîgehên bimînin. Hûn natirsin ku zarokên we birçî û bêkes bimînin, ji ber ku ew welatê hûn lê bicih bûne, ne kesekî ji ber wan sedeman digirin û ne kesekî ji ber bêkariyê birçî dihêlin.

Welatparêzî

Lê di ser de hûn li ser tora civakî pesnê xwe didin û rexneyan li kar û xebatên kesên li welat mane dikin. Di ser de jî hûn tevî hemû derfetên xweş ên li wan welatan tiştêkî ji bo doza gelê xwe nakin.



Bêguman ev gotin ne ji bo wan kesên welatparêz û fedakar ên ku ji sibê heta êvarê di nava xebatan de ne û di hemû çalakiyan de cihê xwe digirin in. Lê ev gotin ji bo wan kesên ku tu kar û xebatekî ji bo gelê xwe nakin û dawiya şevê xwe li ber leptopan dirêj dikin û rexneyan li her kesî dikin in.

Li şûna ku ez jî dilê we xweş bikim û hinekî rûyê we bilkenînim min derd û kulê we geş kirin. Ji bo hûn vê rexneyê li min nekin ez behsa çîrokeke din a cîrana xwe Eyşo bikim. Beriya çend salan ji welat çûye Almanayê û li wir bicih bûye. Wê rojê çîroka xwe û cîraneke xwe li ser malpera civakî parvekiribû.

Sohbeteke wiha di navbera Eyşo û cîrana wê Helo de derbas dibe:

**Helô:** Cîranê, xêre hûn hema her serê çend mehan dîwar mîwarê malê tevî boyax dikin. Perdên malê nû dikin û gelek tiştên din. Ma ewqas mesref ne zêde ye.

**Eyşo:** Keçê porkurê ma ne çêtire ku bi wan perê zêde mîrik here li tolaziya bigere an jî pere têkevin ser hev û zêde bibin biçê mîrekî bikuje an jî jineke din bîne.

**Helô:** wîîî cîrana Eyşo bi xwedê xebera te ye ez jî wek dînan diçin peryê zêde hiltînim û jê re didim ser hev.

Hesen Hemkê

**Kêş û vekêşan siyasetê**

Gengaz e weki li ti devera cihanê ya ku huner bi 'yafteya hevçaxiyê' lê tê afirandin, gels û gelemşeyên estetîkê, biqasî ku li welatên *Cihana Sêyan* (yên derî navendê) bûye bar û barûdox -barûdox dibêjim lewre li van deveran hunera hevçax, weki hemû cureyên rojavayî, mîna qewimîneke derasayî tê ditîn û di ser vê re tê bilêvkirin- û bi gelek tiştên din re yê ku rasterast ne têkildarî pirs û pirsgerêka sereke ne ketine qayîşkêşanê (wek qonaxên siyaseta herêmi, guherîn û veguherînên naypayîn, kêşeya xitimîn, ve avakirin û vexitimînê) û li ser milê (mil, ango wek însaf) niwînerên xwe yê 'ji herême' maye, kronîk nebûye. Li gorî bîr û boçûnên rexnegirên hunera hevçax û kuratorên li navendê, hemû hunermendên ku li bajarên Kurdistanê -çî li Diyarbekirê çî li Mêrdîn an li Êlihê-dijyan û diafirandin, herêmi bûn, çî ku ji kêşeyên mêjûyî yê ku çî û cîgehên ku ew lê bûn veguheztûbûn navendîtiyê, ji vir heya bi Merixê bi dîr ketûbûn û ev e ne gunchê wan bû! Bi tenê rêyek li ber wan mabû weki xwe ji vê yafteyê vebiqetînin ku ew jî, bêguman teoriyên post-kolonyal bûn; çî bikin, çî bifarinin, çî daynin û çî bişînin jî, dawîya dawîn de digel kêş û vekêşan siyasetê bihata xwendin û nirxandin.

**Sewta hunermendên kurd**

Gelo, vê nêzîktêdayîne jî ber çî me di hunermendên hevçax ên tirk de nedît? Ne di destpêka salên 90'î de (ku weke salên dijatiya desthilata pentûrê dihat bilêvkirin) ne jî salên piştî 2000'î. Bi tevî ku -bixwe digotin- sînorên di navbera etîk, estetîk, rojanî, jîyan û hunerê de hatûbûn danîn, parîyeke din zelal bûbû. Belam tûrêjen vê zelaliyê, di kêlika ku digihîşt ser ber-



**Weswese 2**

**Şener Ozmen**

hem û bertekên hunermendên kurd, bi carekê re vedimîrî, hingê awirên civaknas a hunerê zîqî arîşeyên estetîkê dibû. Badilhewa nîn bû gava mijûnûsê hunerê Osman Erdenî, di ser têgehên wek pirsgerêka kurd, berhemdariya hunerî, mode, bertek û estetîkê, qala pratîkên li Diyarbekirê dikir û di niqaşên xwe yê *Zero Tolerance* de (Stenbol, 2012), bal dikîşand ser sersarîtiya li 'xweşikiyê'. Bêguman ev hişyariyek bû û li gorî bîr û boçûnên Erdenî diviya ku hunermendên kurd, dev ji arîşeyên xwe yê aidîyetê (belkî jî ji kurdûbûyîne) berdîn û bi têgehîne dilveker -û steril- vegerin cihana hunerê. "... belbet hunermend -qala hunermendên kurd dike- *dixvaze dengê xwe bilind bike, di vê bilindkirinê de estetîka kevneşopî jî wek pêdiviyekê derdikeve pêşya wan. Dibe ku peyva estetîkê bi me xweş neyê, disan jî divê hunermendên li*

*Diyarbekirê parîyeke din dêbn û bala xwe bidin xweşikiyê. Wek taktîkekê dibêjim, ku îro ro, pûte bi xweşikîya kevneşopî û estetîkê nekin jî, ev yeka ban berhemên wan di çavên min de erzan nake...*"

**Peyva Pilingên Anatolyayê ji ku derket?**

*Helbet ji Çaremîn Çalakiya Civanan (Youth Action 4, Stenbol) ya sala 1998'î ku wê salê sernavekê li çalakiyan nehatibû danîn û Akay, beşdarbûna hunermendên kurd bi van gotinan nirxandibû; "Hunermendên ku nemaçe ji rojîlatê dibatin, arîşeyên herêma xwe jî bi xwe re anîbûn pêşengebê. Pêşengeba li TÜYAP'ê, li herberî rûdaweke seyr a sosyolojîk bû."* Çî ku hunermenda kurd Jûjinê -şûnenav jî peyva jûjî û jînê pêkhatibû- di wê çalakiyê de bi cilan ketûbû ku heya hingê ti hunermenda performansê, culhet nekiribû weki performanseke wehaki (li



**Pilingê Sîngaporî**

pêşberî temaşevanan) li dar bixwe û jî xeynî çend hunermendan, kesî jî wê derûdorê, qala Jûjinê û çalakiya wê nekiribû. Pilingên Anatolyayê (ango Pilingên Kurd), bi xwinê dest bi çî-roka welatê xwe kiribûn. Ji ber hindê min kevala Heinrich Leutemannî (Li Sîngaporê Xebata Rêçêkirinê Ya Ku Tê Bîrrîn) ya ku di daristanekê de kêlika êrişî pilingekî sîngaporî ya li dijî karmendên rêpîv yê ewropayî nişani me dida ku niha li Muzexaneyê Neteweyî ya Sîngaporê bû, jî bo vê nivîsê veqetand. Hiş û bîra bajarvaniyê (nexşekirina welêt) bê çawan jî aliyê pilingekî ve dihat xerakirin! Lewre piling, rasterast xwe çengî ser kel û pelên mêtîngiriyê dikir.

**Bêheysiyetiya berdestbar**

Tiştî ku me di pêsîrtengiyê de di-hêle, gelo ne xwendinê me yê post-kolonyal bin? Û em van xwendinên xwe yê post-kolonyal, li bejna kîjan civakê dikin!? Ecêb e, bi dû salên 2000'î re, gelek hunermendên tirk pîrsa ermenan xistûbûn nav kar û barên xwe yê hunerî, weke ku hîn nû rûbirûyî kir û kiryarên komara xwe bibin, bi çavbirçîtiyê nebinayî, ketin dû çîrok û qetemetelokên koçbarkirinê. Weki ku Barîş Ünlüyî jî di xebata xwe ya bi navê *Türklük Sözleşmesi* de digot, ev nêzîktêdayîna han, encax bi hindê dihat ravekirin ku weki ti car li ser tevekê nijada xwe nedîfikirin. Ew rewşa derûnî ya ku hemtawaniyê ku ne di dilqê tawanê de bû, diafirand, di hemûyan de derdiket mexderê. Wek

çî? Sala borî, mezintirîn fûara hunerê ya Tirkîyeyê *Contemporary Istanbul*, bi navê xwe yê din CI, jî bo endamên çapemeniya welatên dereke û bengî-yên hunerê, roja îniyê rêkeftî 14.08.2019, bi daxuyaniyêke lezûbez piştgiriyê dabû *Bizaya Kaniya Aştiyê* ya artêşa tirkan ku derbasî Rojavayê bûbû û ev geşedana hanê, wek nûceyêke sansasyoni (di daxuyaniyê de qala xalîkirina herême ya ji terorîstan dihat kirin), di malpera *sanatakatê* de hatibû weşandinê. Sosreta mezin ew bû ku hingê çend hunermendên hevçax î kurd jî, di medyaya civakî de, parvekirinê zir-nijadperest teletel ecibandibûn. Ji ber çî? Ji ber ku ew xwediyê xwe û koleksiyonên dewlemend bûn, xwedî erk bûn û kurdûbûyîn, fena bêheysiyetiyeke berdestbar (weke wê peywendîya qayîşokî ya di navbera çand û mêtîngiriyê de hatibû danan ya ku Edward Said bi ser ve bûbû), li gorî şert û mercên Tirkîyeyê û pileya tirkûbûyîna biimtiyaz geh dirêj dibû û geh kin dibû.

Ku em vegerin ser jakawên xwe; hebûn helbet pilingên me jî, belam ew hebûn, di nav qeyraneke niwandînê (temsîl) de bû, ku desthilatiya hunera hevçax (yên salên 2000'an), bêyî ku kurdûbûyîne bi gels û gelemşeyên wê yê etno-polîtîk ve girê bide, wê di ser qeyraneke din re (di ser pîrzimanî û pîrçandîyê re) dixwend û dixwest pilingên me jî bi van çemikan ranêzikî pîrsa xwe ya sereke bibin, qet nebe di civatan de bi kulzikî xeber nedîn.

Bi ser ketin ne wilo?  
 (1) Ji bo nivîsa Ali Akayî ya bi navê *Genç Etkinlikler (1995-1998) bnr. Sanatın Sosyolojik Gözü*  
 (2) <http://www.sanatakat.com/vien/contemporary-istanbuldan-baris-pinari-harekatina-deste>


**Li Hambûrgê belgefîlmên kurdî**

Ji aliyê Kolektîfa Filman a Avakîno û Copenhagen Underground li bajarê Hambûrgê Almaniyayê 4 belgefîlmên kurdî hatin nîşandan. Dahata bilêtên ku hatin firotin gihişt Heyva Sor a Kurd.


Bernameya nîşandana belgefîlman li Amargî Kultur Treffpunkt a Hambûrgê pêk hat. Navê filmên ku hatin nîşandan ev in; belgefîlma derhêner Shukri Mahmood a bi navê Qijik, belgefîlma derhêner Zanyar Muhammadineko ya bi navê Konsept a Min a ji Bigêl, belgefîlma derhêner Rafiq-fuad Yarahmadi ya bi navê Çîroka yê Mayî, belgefîlma derhêner Veysi Altay ya bi navê Nû Jin.

Di van çar filman de tekoşîna kurdan bi perspektîfên cuda tê nîşandan. Her wiha mijara filman huner, feminîzm û antîfaşîzm e. Hat ragihandin ku dahata bilêtên bîr firotinê de bigihêje Heyva Sor a Kurd. Bilêt bi peretî nîn in û çî jî dilê temaşevanan were de ewqasî bidin bilêtan.

**HAMBURG**



Koma şanoyê Teatra Jiyana Nû de bi listikên 'Bêrû' û 'Tenê Ez' ve derkeve turneya Ewropayê. Turneya ku 9'ê sibatê dest pê dike de 20'ê sibatê bi dawî bibe û li gelek welatên Ewropayê were listin



Teatra Jiyana Nû (TJN) bi salan e di bin banê Navenda Çanda Mezopotamyayê de bi kurdî şanoyê dike û heta niha bi dehan listikên şanoyê bilîzin niqaşan bikin. Dê bi koma şanoyê di şert û mercên herî zehmet de xebatên xwe didomîne û niha jî ji bo turneyê berê xwe dide welatên Ewropayê.

Endamê komê û şanoger Omer Şahîn têkildarî turneyê ji rojnameya me re axivî û diyar kir ku li ser vexwendina 'Theater An der Ruhr' ya Almaniyayê û komên şanoyê yê Swîsreyê diçin turneyê. Şahîn

**TJN'ê berê xwe da Ewropayê**

kir ku heta niha gelek caran xwestine listikên xwe bigihînin temaşevanên Ewropayê lê her carê bi hincetên cuda daxwazên wan hatine redkirin. Şahîn got dema dixwazîna derkevin pêşberî temaşevanên derveyî welat gelek zehmetiyan dikişînin.

**'Em biçin ew ê jî werin'**


Omer Şahîn hezkiriyên şanoyê û zimanê kurdî vexwend listikan û wiha got: "Mixabin li Ewropayê şanoya kurdî pir kême e û hewcedariya temaşevanan bi listikên kurdî heye. Girseye cidî ya şanoyê heye û ger em biçin de temaşevan jî werin listikan temaşe bikin."

Şahîn bibixist ku niha di demên pir aloz û zehmet de derbas dibin û ligel vê yekê di van salên dawîn de bi listikên xwe derketin ser dikê û temaşevanan hem li metropolên Tirkîyeyê û hem jî li Kurdistanê eleqeyêke baş nîşan daye. **AMED**

**Bernameya turneyê**

Listika bi navê 'Tenê Ez' jî filma Charlie Chaplin hatiye wer-girtin û de 9'ê sibatê li Mulheimê û 11-12'ê sibatê li Berlinê, 13'ê sibatê li Zurichê derkeve pêşberî temaşevanan. Teksta nivîsê jî aliyê Cihat Ekîncî ve hatiye nivîsandin û her wiha

Rûgeş Kirici, Cihad Ekîncî û Omer Şahîn derhênerên listikê ne. Liştikvan ev kes in; Mehmet Musaoglu, Baran Yilmaz, Omer Şahîn, Rûgeş Kirici, Cihad Ekîncî. Di beşa teknîkê de jî Xebat Bayram û Rewşan Apaydin cih digirin.





# Kambax e jîbîrkirin

Reyhan İke

Li goristaneke me ya pîrbûyî ji goran, digeriya Welat. Goristaneke bûye warê mişextan. Li vê goristana di sînga çolê de cih digirt, mîna 2 hezar 500 mirovên çiyayî, hewdên kulîlkên çiyayî hebûn. Nêrgiz û şîşanan, beybûn û rihanana li ser gorên mişextên çiyayî di dilê çolê de rehên xwe berdabûn axê. Welat, 'dîn' bû li gorî piraniya me yê xwe bi aqil dibîn. Ciwanekî hijdeh salî; zer, bejin navîn û dagirtî bû. Ji birka nav goristanê dewlikê di destê xwe de tijî av dikir, li ser gorên kesên nas dikir digeriya. Bi dewlikê avê yê di destê xwe de kulîlkên li ser goran avdidan. Yê bi 'aqil' dibe ku ji bir kiribin, kurd xayintî dihesibînin jîbîrkirinê. Lê welat xwe di-tewand li ser axa wan goran. Axa wan goran maç dikir. Berê xwe dida rojê û mîna silav bide, destên xwe bilind dikir. Paşê destê xwe dibir ber devê xwe û maç dikir. Ew maça xwe ya bi ax û tavê şuştî, datanî ser wêneyên kesên di gorên li goristanê de û silava xwe ya herî pîroz dida wan. Her kesên ku welat dîn dihesiband, ev wekî nîşana dînbûna wî dipejirand. Lê di rastiyê de welat bi wî hişê xwe yê tijî hîs û hest rêzdariya xwe ji demboriya xwe re dianî ziman. Wekî pêdiviya pêkanîna şîreta dapîr û bapîran a neji-bîrkirinê, dîrsa ku zanebûn ne jîbîrkirin e dida me. Bi wê zanabûnê diçû tewafa wan kêlên goran û di wê kêliyê de dilê welat di qefesa singa min de lê da. Di wê kiriyara Welat de hişek hebû. Hişekî ku em bi aqilê xwe yê



'hemdem' nikarin fêma bikin. Hişek biyaniyê vê serdema ku bi mişextiyar hewl dide bi me bide bîrkirin û me neçarî jîbîrkirinan dike. Di giyana welat de hişê Zurvan hebû.

Zurvan bû navê xwedawendê; anku zeman. Zurvan xwedîya her tiştî bû li van axan. Afîrînera gerdûnê bû Zurvan. Bêyî ku Zurvan hebe, dîrokê nedikarî biherike. Xu-liqarî jî di nav de, bêyî Zurvan wê her tiştî bê liv û tevger bimaya li gorî baweriya dapîr û bapîrên me. Ji ber Zurvan serê her tiştî bû. Hêza livandin û xistinê tevgerê ya her tiştî bû Zurvan. Zurvan di wateyekê de hêza

dîtinê ronahî bû û ronahiyê jî ji Zurvan xwe berdida ser hişê zindeweriyê li gorî şîretên wan ên ji bo me.

Bi qasî temenê Zurvan ê nedihat zanîn, di xurcîkên hişê xwe de bîranîn dagirtibûn. Rayên van bîranînan xwe berdîdan dilê Zurvan a ku hişê demboriya wan xwe di parast. Ma ne dane-hevek ji bîranînan bû hişê vê civakê? Ew hişê bûyî civak, bûyî çand, bûyî dîrok bû diafirand û xwebûna xwe di her mercê de diparast. Ji ber vî hişî jî bîr nedikir. Zurvan giyana her serêlî, stran, heyranok, payîzok, lawîk û bolîkek me; her çîrok û çîranokek me, her destan û serpêhatiya me, her şîret


û helbesta me, her mamik û biwêja me bû. Bi riya dengê dilê Zurvan ê bûyî rist û awaza qirika xaka me, her diherikî çemê bîranînan me. Diherikî û çanda me gur û geş dibû. Ev giyana nemiriya me bû.

Paşê mişextiyar dest bi mişextkirinê kir. An ku kuştînan bi saxî. Kaniyên stranên me, giyana civakê zimanê me, huner û wêjeya me, hemû demboriya me da ber xwe wan kuştînan. Hewla dayîna jîbîrkirinê bû mişextkirin. Ji ber hişê civakan bi demboriya wan zindî ye. Yê demboriya xwe jî bîr dikin, di rastiyê de yê hatin qirîkirin in. Anku qirbûna herî kambax e ji

bîrkirin. Ji ber vê ye di baweriya me kurdan de jîbîrkirina demboriya xwe, her tim wek xayintiyê hatiye hesabandin. Ji ber di bîngeha civakbûnê de neji-bîrkirin û birka hişmedî ya ji demboriyê hatî dagirtin heye. Civakên xwedî bîranînan û hişmendîya wan a dî-rokî xurt, tevî her tiştî dikarin li ber xwe bidin. Ji ber hişê civakan bîranînan e ji aliyekî din ve. Vê daneheva di birka bîranînan demboriyê de dihişt ku mirov biafirînin û xuliqar bin. Ev hişê civakî bû. Anku awayê herî bi bandor ê xweparastina civakan bû; bi taybetî ji bo civaka me ya ku tê xwestin xwe ji bîr bike.

Talde

Dr. Erdal Sîpan



Coronavîrus malbateke mezin a vîrusan e. Di laşê sewalên wekî şevşevok, beraz, pişik, kûçik, çivîk, mar û hwd. de dibin sedema nexweşiyê. Gava di genetîka wan de hinek guherîn (mutasyon) çêbûn ji sewalan derbasî merivan dibin. Piştî hinek guherînên din ji merivan jî derbasî merivên din dibin û bi vî awayî di demeke kin de di nav civakê de belav dibin.

Berî nîha di sala 2003'an de coronavîrusa bi navê SARS-CoV li Çînê derkete holê û bi sedan kesên ji ber vîrusê jiyana xwe ji dest da. Rêjeya mirinê jî sedî 10 bû. Li gorî lêkolînan hate tespîtkirin ku ev vîrus ji cureyê pişik derbasî merivan bûye. Di sala 2012'an de vîrusê li Erebiyê Siûdî bi navê MERS-CoV coronavîrusê nû jî heştîran derbasî merivan bû û di sa gelek kes pê mirin. Di vîrusê de rêjeya mirinê jî sedî 35 bû. Lê ji ber ku zêde belav nebû pir kes pê nemirin.

Di kanûna 2019'an de li Çînê li bajarê Wuhanê di gelek nexweşan de zatûre hate dîtin lê sedema nexweşiyê nedihate zanîn. Piştî lêkolînan di van kesên de coronavîrusê nû hate tespîtkirin û ev vîrus wekî 2019-nCoV hate bi-

navkirin. Di serî de zanyar û pisporan digot ku ev vîrus ji maran derbasî merivan bûye lê a nîha zêdetir li ser ihtîmala şevşevokan disekin û hîn jî mijar nehatiye zelalkirin. Heta nîha ev vîrus li gelek welatan di hezaran kesên de hatiye dîtin û bi sedan kesên ji ber vîrusê jiyana xwe ji dest daye. Kesên ku ev vîrus girtine ji wan jî sedî 3-5 kes mirine. Coronavîrusa bi navê 2019-nCoV li gorî yê din zûtir belav dibe û her diçe kesên ku vîrus girtine zêdetir dibin. Beramberî vîrusê hejmara miriyan jî roj bi roj zêdetir dibe.

## Vexyaniyên Coronavîrusê

Di nexweşan de vexyaniyên cuda tên dîtin. Gelek caran av ji pozê nexweş tê, qirik û serî diêşin, nexweş dikuxe û laş disincire. Di hinek kesên de bêtaqetî, emel û xesara gurçikan jî derdikeve holê. Carinan nexweş rihet bêhna xwe nade û nastîne. Kesên ku pergala wan a xweparastinê lawaz, kesên ku nexweşiyên domdar (kronîk) ên wekî dil, pişik, kezeb û gurçikê bi wan re hene û her wiha kesên temendirêj û zarok nexweşiyê giran derbas dikin. Di van kesên de ev vîrus carinan dibe sedema zatûre û bronşîtê. Kesên ku heta nîha jiyana xwe ji dest daye exlebe ev kes in. Ev vîrus

bi tenê di pergala hilmijê de bi cih nabe carinan rêviyan, kezebê, mêjî û birikan jî digire.

## Çawa derbasî merivan dibe?

Piştî ku nexweş kuxiya û bêhnijî ev vîrus derdikeve derve û wekî dîlopan di hewayê de asê dimîne. Bi bêhngirtinê derbasî merivên din dibe. Her wiha bi merhebatiyê jî dibe ku ev vîrus bê girtin. Kesên ku temasî sewalên nexweş dikin jî dibe vîrusê bigirin. Vîrus jî dev û pozê merivan re dikeve bedenê, derbasî qirik û pişikên dibe û dûre li hemû laş belav dibe.

## Tedawiya Coronavîrusê

Nexweşî gelek caran wekî zekemê dest pê dibe û xwe bi xwe derbas dibe. Heke agirê laş zêde be divê bê daxistin. Nexweşên ku agirê wan daneket û nexweşiyê li wan giran kir divê ji Coronavîrusê bikevin şîkê û herin nexweşxanê. Kesên ku ji cihê nexweşî lê zêde hatibin an jî kesên ku bi nexweşan re temas kiribin divê hişyar bin. Hîn tedawiyeke xweser tune. Li ser tedawiyeke xebat didomin. Wekî nexweşiyên vîral ên din, di vîrusê de jî antibiyotîk bi kêr nayên divê neyên bikaranîn. Nexweş divê xwe bêav nehêle û wekî her car xwarina xwe bixwe.



## Xweparastina ji Coronavîrusê

Divê merivên saxlem destên xwe yê neşuştî bi çavên xwe, bi pozên xwe û bi devê xwe nexin. Beriya xwarinê gere dest bi sabûnê bîn şuştin û ji kesên nexweş dûr be sekinin.

Hingî ji destê nexweş bê divê dernekeve derve li mala xwe rûnê û gava kuxiya yan jî bêhnijî bi dest-

malekê devê xwe bigire û nehêle vîrus li derdorê belav bibe. Heke di wê kêliyê de destmal tune be nexweş gava kuxiya dikare milê xwe bide ber devê xwe. Her wiha bikaranîna maskeyê jî wê pêşiya berbelavbûna vîrusê bigire. Cihên ku destên nexweş lê ketibin divê werin paqijkirin. Xebatên li ser parzayê didomin.